Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê
FKKS

# KOMELE

- Avakirin
- Birêvebirin

Stockholm - 2000

RONI KONSULT & ÖVERSÄTTNING *

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê

# KOMELE

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê

# KOMELE

**Nivîsandin û amadekirin:**
**Beşê kurmancî:**
Mustafa Aydogan
Vîldan Tanrikulu

**Beşê soranî:**
Hemîd Gewherî
Asî Rabatî
Newzad Welî

**Pergela rûpelan**
F. Marsil

**Stockhom-2000**

# Naverok


## Pêşgotin

### Beş: 1

1. Komele
1.1 Komele çi ye?
1.2 Li Swêdê mafê avakirina komeleyan
1.3 Avakirina komeleyan
1.3.3 Armanca komeleyê
1.3.4 Qeyidkirina komeleyê
2. Endamî
3. Birêvebirina kar û barên komeleyê
4. Avahîya komeleyan
5. Fînansmana xebatên komeleyan
5.1 Heqê endamîyê
5.2 Alîkarî
5.3 Proje
6. Girêdana komeleyan

### Beş: 2

FKKS, avahîya wê û girêdana wê ya bi komeleyên endam re
7. Kurtedîrok/ armanc û avahîya FKKSyê
7.1 Dîroka avakirina Federasyonê
7.2 Armanca FKKSyê
7.3 Avahîya FKKSyê
7.4 Aborîya FKKSyê
7.5 Prensîpên maf û berpirsiyarîyên FKKSyê li hember komeleyên endam û yên komeleyên endam li hember FKKSyê
7.5.1Berpirsiyarîya FKKSyê li hember komeleyên endam
7.5.2 Berpirsiyarîya komeleyan li hember FKKSyê
7.6 Girêdanên FKKSyê yên di sewîyeyên neteweyî û navneteweyî de
7.7 Dawî/encam

## Pêşgotin

Komîteya Giştî ya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, pişti gelek civîn û konferansên bi komeleyên endam re, gihaşt wê encamê ku vê broşura navê wê "KOMELE" ye, amade bike û li komeleyên xwe yên endam belav bike. Ev buroşura ha, ji alîyekî ve ji bo perwerdekirina komeleyên endam, hevahengîya kar û xebatên berdewam e; ji alîyê din ve li ser awayên avakirin û birêvebirina peywendîyên di navbera komeleyên endam û FKKSyê de ye. Herweha ji bo beşdarîya endaman a jîyana komeleyetîyê û ji bo bi awayên demokratîk û birêvebirina xebatên komeleyan a giştî û bi vê rêyê çareserkirina pirsên wan ên li Swêdê yên civakî, rênîşandêrek e jî.

Komîteya Giştî ji bo vê projeyê, alîkarî ji Wezareta Entegrasyonê wergirtîye. Ji bo komeleyên endam, bi hevkarîya ABFa Stockholmê ve li Nynäshamnê kurseke perwerdekirinê hat amadekirin û 24 komeleyên endam bi nûnerên xwe ve beşdarî vê kursê bûn. Dû re, ev broşur bi du zaravayên kurdi; kurmancî û soranî hat amadekirin. FKKSyê herweha ji bo komeleyên endam tora (nätverk) internetê amade kirîye û dixwaze di pêşerojê de, her komele bi xwe bibe xwedîya malrûpela xwe ya internetê.

Broşura "KOMELE"yê di kar û xebatên komeleyan de, wêneyekî demokrasîyê radixîne ber çavan û rêya avakarîya karên komeleyan a bisîstem zelaltir dike. Ev buroşur ji du beşên bingehî pêk hatîye û her beşek di kar û xebatên komeleyên kurdan de, li ser alîyekî xebata komeleyan a girîng radiweste û maf berpirsiyarîya endam û birêvebirên komeleyê di birêvebirina xebatên komeleyan de, rohnîtir dike.

Hêvîya me ew e ku ev dê bibe bingehê xebateke xurttir.

**Bi navê Komîteya Giştî**
**Keya Îzol**
**Serok**

# 1. Komele

## 1.1 Komele çi ye?

Di her civatê de, ji bo birêvebirina jiyana civakî, gelek awayên rêxistinan û birêxistinbûnê yên cuda henin. Di civatên hevdem de, yek ji wan awayên rêxistinan û bi rêxistinbûnê jî komele û endamîya komeleyan e.

Komele awayekî rêxistinan e ku ji ber pêwîstîya hin pirs, armanc, an jî berjewendîyên civakî, neteweyî, meslekî û.hwd yên hevbeş derdikeve ortê. Ew ji alîyê kesên ku li ser van pirsên hevarmanc li hevdu dikin ve tê avakirin û herweha girêdaneke van kesan a azad e.

## 1.2 Li Swêdê mafê avakirina komeleyan

Li hin welatan, mafê avakirina komeleyan û pirsên ku komele bikaribin, an jî nikaribin pê mijûl bibin û hejmara avakarên komeleyan a herî kêm, bi qanûn û qaîdeyan ve hatinin tesbîtkirin.

Lê li Swêdê, azadîya mafê avakirina komeleyan û endamîya wan, di qanûna bingehîn de hatîye parastin û ji bo pirsên ku komele dikarin, an jî nikarin pê mijûl bibin, tu sînor tune ye. Ango, mirov dikare li ser her pirsê û li her qadê, bi kesên din re komeleyekê ava bike.

Li Swêdê, herweha ji ber ku dezgehên civatê (yên dewletê, bedîyeyan û hwd) yên cuda ji bo xebatên komeleyan alîkarîyê didin, mafê avakirin û birêvebirina xebatên komeleyan ji alîyê aborî ve jî tê teşwîq kirin û ewlekirin.

Loma jî dema ku mirov li Swêdê, li hin agahdarîyên li ser xebatên komeleyetîyê binêre, mirov dê bibîne ku hejmara endamên komeleyan li Swêdê, ji nifûsa Swêdê deh caran zêdetir e. Mirov dikare di nav bi qasî du sed hezar komeleyên ku li Swêdê henin de, li ser her pirseke civatê, komeleyekê bibîne.

Du awayên komeleyan yên esasî henin. Yek ji wan komeleyên aborî ye û awayê din jî komeleyên îdeel e.

Ferqa esasî ya di navbera van herdu awayên komeleyan de, ew e ku di komeleyên aborî de, armanca avakirina komeleyê, ji bo

parastina berjewendîyên endaman yên aborî ye û loma jî giranîya xebata van komeleyan ji xebatên aborî pêk tê. Koperatîf yek ji wan awayên komeleyên aborî (ekonomisk förening) ye.

Awayê komeleyan ê din, ango komeleyên ideel, ji bo berjewendî, armanc, an jî pirsên hevbeş tên avakirin.

Mirov dikare ji komeleya kirêdaran heta komeleyên li ser pirsên jîngehê, sendîkayên kardar û kardêran, yên qencîxwazan, yên mafên mirovî, yên çand û perwerdeyê, yên biyanîyan, an yên sporê, her cureyê komeleyan li Swêdê peyda bike. Ev jî diyar dike ku bê xebata komeleyan di jiyana Swêdê ya civakî de, çi qasî girîng e.

Agahdarîyên di vê buroşurê de, li ser avakirin û birêvebirina kar û barên komeleyên îdeel in.

## 1.3. Avakirina komeleyan

### 1. Mafê avakirina komeleyan

Weke ku berê jî hat behskirin, li Swêdê maf û azadîya avakirina komeleyan bi qanûnan ve hatinin pejirandin. Loma jî bikaranîna mafê avakirina komeleyan, bi tu dezgeheke fermî ve ne girêdayî ye. Lê, heger komele bixwaze, bo nimûne; navê komeleyê biparêze, yan heger li komeleyê hin kes bixebitin ku komele mecbûrî dayîna meaş û bacê be, yan jî komele bixwaze ji alîkarîyên ku civat bi xwe ji bo karên komeleyan amade dike, parê werbigire, wê demê, avakirin û qeyidkirina komeleyan li ba hin daîreyên dewletê û yên belediyeyê yên fermî dibe pêwîstîyek.

### 1. Destûr

Ji bo ku komeleyek damezrandî bê hesibandin, divê destûreke hebe ku di civîna avakirina komeleyê de, ji alîyê endamên wê yên avakar ve hatibe qebûlkirin. Tu qanûn, an qaîdeyên dewletê yên resmî tune ye ku bibêje, divê di destûrekê de çi hebin. Ji ber vê yekê, divê destûr ji bo birêvebirina karên komeleyê, wek qanûnê bê dîtin.

Gelek girîng e ku heta îmkan hebe, divê di destûrê de, qaîde-

yên gelek tiştan hebin, da ku cîh ji bo minaqeşeyên li ser qaîdeyan nemîne. Lê ji alîyê din ve jî ne baş e ku destûr ew qasî pir fireh be ku kes di xwe re nebîne bixwîne.

Divê di destûra komeleyekê de, ev hebin:
* Navê komeleyê
* Cîhê komeleyê, yanî beledîyeya ku komele lê ye.
* Armancên komeleyê
* Qaîdeya heqê endamîyê
* Qaîdeyên endamîyê, ji endamîyê derketin û derxistinê
* Qaîdeyên pêkanîna kongreyê û maf û awayê dengdanê
* Organên komeleyê, erkên organan û hejmara endamên wan
* Peryoda xebatê
* Qaîdeyên guhertina destûrê
* Qaîdeyên hilweşandina komeleyê û belavkirina hebûnên wê

Ji ber ku tu qanûn an jî standard tune nin ku bibêje, bê divê destûra komeleyekê çawa be, babetên jorîn, li gora mezinbûna komeleyê û xurtbûna wê ya aborî, dikarin zêde bibin an jî kêm bibin.

### 1.3.3. Armanca komeleyê

Divê armanca komeleyê di destûrê de hebe û bi awayekî zelal bê formulekirin. Ji bo komele bikaribe ji bacê azad be û weke komeleyeke îdeel bê hesabkirin, ev şert e. Formulasyona benda armancê, divê nebe sedema şikeke weha ku komele karekî ticarî dike.

### 1.3.4 Qeyidkirina komeleyê

Ji bo qeyidkirina komeleyan tu meqamekî navendî tune ye. Di qanûnan de, hatîye diyarkirin ku qeyida (register) komeleyên îdeel a giştî, li ba tu meqamekî fermî nayê çêkirin. Lê di hin rewşên taybetî de, divê miracaeta avakirinê, an jî miracata xebatên komeleyeke îdeel li ba hin meqaman bê kirin.

Komeleya ku meaş û tezmînatan dide, divê li ba daîreya bacê qeyida xwe çêbike. Gava komele li ba daîreya bacê qeyida xwe çêbike, ew ê numara wê ya organîzasyonê ya taybetî çêbibe.

Meqamên dewletê numaraya organîzasyonê ji bo ku bikaribin zanavê komeleyê nas bikin û wê ji komeleyên din veqetîne, bi kar tînin. Piştî qeyidikirin û wergirtina numaraya organîzasyonê, komele ji bo şandin û razandina pereyan, dikare ji xwe re hesabekî bankayê, an jî yê postgîroyê veke.

Di vî warî de, ya girîng numaraya organîzasyonê ye. Ji ber vê yekê, di warê navê komeleyê de, heger navê komeleyê li ba Daîreya Patent û Qeyidkirinê (PRV-Patent och registerverket) nehatibe qeyidkirin, mafê komeleyê yê takekesî (copyrite) tune ye.

Gava komele karê ticarî bike, yan jî avakarên komeleyê bixwazin ku navê komeleyê ji alîyê kesên din ve neyê bikaranîn, dikarin qeyida komeleya xwe li ba Daîreya Patent û Qeyidkirinê (PRV-Patent och registerverket) çêbikin, da ku bi wî navî tu komeleyeke din nikaribe bê avakirin, an jî qeyidkirin.

## 2. Endamî

### 2.1. Qebûlkirina endamîyê

Di piranîya komeleyan de, kî bixwaze dikare bibe endam. Ji bo wergirtina alîkarîyê û azadkirina ji bacê, divê endamîya komeleyê ji bo hemû kesên ku armancên komeleyê yên di destûra komeleyê de hatinin diyarkirin, qebûl dikin, vekirî be. Divê di destûrê de, qaîdeyên endamîyê hebin.

### 2. 2. Qebûlnekirina endamîyê

Komîteya karger dikare daxwaznameya endamîya mirovê/a şik jê tê kirin ku li dijî armanc û prensîpên komeleyê dixebite, qebûl neke. Divê qaîdeyên ji bo qebûlnekirina endamîyê, di destûrê de hebin. Divê mafê mirovê/a ku miracaeta wî/wê nehatîye qebûlkirin hebe ku doza xwe bibe kongreyê.

## 2. 3. Ji endamîyê derxistin

Di komeleyên îdeel de, qaîdeya esasî ew e ku endamekî/ê komeleyê bi hêsanî nikaribe ji endamîya komeleyê bê derxistin. Bê guman komeleyeke îdeel jî weke her rêxistinê, ji bo ku di kar û barên xwe de bi serketî be, divê xwe li hember hewildanên texrîbkar biparêze.

Divê şertên ji endamîyê derxistinê di destûra komeleyê de, pir bi zelalî bên diyarkirin, da ku rê li ber keyfîyetê bê girtin. Ji bo derxistina ji endamîyê, pêwîst e ku endamek ji şertên endamîyê yên esasî bi dûr ketibe, ev yek pir eşkere bikaribe bê tesbîtkirin û herweha berî ku di warê derxistina ji endamîyê de, biryara dawîyê bê dayîn, divê îmkan ji bo endamê/a komeleyê bê amadekirin, da ku ew xwe biparêze, yan jî bîr û raya xwe ya li ser vê yekê diyar bike.

Weke ku di xala endamîyê de jî hatibû diyarkirin, qebûlkirina armanc û destûra komeleyê û dayîna heqê endamîyê, du şertên endamîya komeleyên îdeel yên esasî nin. Loma jî ji bo derxistina ji endamîyê, divê an yek ji van şertên endamîyê, an jî ev herdu bi hevdu re bi awayekî eşkere derketibin holê û divê ev ji bo her endamekî/e komeleyê zelal bin. Cudabûnên fikrî, sewîyeya beşdarîya xebatên komeleyê, yan sedemên weke van, divê nebin bingehê minaqeşekirinê, yan jî sedema biryara ji endamîyê derxistinê. Ev prensîp divê di destûra komeleyê de, bêyî ku ji rê bide tu şirovekirinan, bi zelalî bê formulekirin. Ev prensîp bi awayekî giştî, weke pîvana demokratîkbûnê û demokrasîya xebata komeleyeke îdeel tê qebûlkirin

Desthilata biryara ji endamîyê derxistinê, divê weke qaîdeyeke giştî ya kongreya komeleyê be. Lê ji ber sedemên pratîk û bi mebesta tedbîrê, bi şertê ku destûrî be, divê desthilata komîteya karger hebe ku heta di kongreyê de, biryarek bê dayîn, bikaribe endamîya endamekî/ê rawestîne.

Berî ku endamek bê avêtin, divê di kongreyê de, ji bo wî/wê firsend bê dayîn, da ku ew li ser vê pirsê, bikaribe fikra xwe bibêje. Ji bo biryareke weha, divê sedemên berbiçav hebin.

## 2. 4. Lîsteya endaman

Divê li her komeleyê, lîsteya endaman hebe û di wê de, nav, navnîşan, hejmara telefonê û ger hebe, navnîşana posteya elektronîk hatibin nivîsandin.

Ji bo amadekirina lîsteya endaman, ya baştir ew e ku komele blanketekê çêbike:

# 3. Birêvebirina kar û barên komeleyê

Weke ku berê jî hat beshkirin, komele di navbera kesên xwedîyên berjewendî, pirs, an jî armancên hevbeş de, girêdaneke azad e. Ev xusûsîyeta rêxistinê, di rêvebirina kar û xebatê de jî xwe diyar dike. Serkettina di kar û barên komeleyê de, bi awayê beşdarbûn û birêvebirina wan ve girêdayî ye.

Di hin komeleyên piçûk de, gelek caran tê dîtin ku mirovek berpirsîyarê/a gelek karan e. Divê ev pirs bi lez bê çareserkirin, na na, sînorê navbera berpirsîyarîyên cuda tev li hevdu dibin. Ji ber vê yekê, ya baştir ew e ku her kesek berpirsîyarê/a karekî be.

# 4. Avahîya komeleyan

Avahîya komeleyan bi awayekî giştî ji hin organên bingehî pêk tê. Di avahîya komeleyan de, li gora mezinbûn, an jî hin taybetîyên komeleyan, dikarin ji derveyî organên ku navên wan li jêrê hatinin nivîsandin, hin organên din jî hebin.

Bi giştî, divê di komeleyekê de, ev organên bingehî hebin:

1. Kongre
2. Komîteya Karger
3. Komîteya Çavdêr
4. Komîteya Rawêj

## 4.1 Kongre

Kongre organa komeleyê ya herî bilind û desthilatdar e. Bi beşdarîya ji %51ê endaman çêdibe. Qaîdeya giştî ew e ku endamên komeleyê bikaribin li ser hemû pirsên komeleyê minaqeşe bikin, biryaran bidin û kesan ji bo organan hilbijêrin. Lê, divê her pirsa

ku di kongreyê de, bê minaqeşekirin û li ser biryar bê dayîn, di rojeva kongreyê de cîh bigire. Rojeva kongreyê ji alîyê beşdarên kongreyê ve tê tesdîqkirin.

Divê di kongreya komeleyekê de, bi giştî li ser van babetên jêrîn bê rawestandin:
* Avahîya komeleyê
* Guhertina destûrê
* Hilbijartina organên komeleyê
* Butçeya/rapora aborîya komeleyê
* Rapora xebatê û minaqeşeyên li ser wê
* Plana xebatê
* Ji bersîyarîyê azadkirina endamên Komîteya Karger
* Hilweşandina komeleyê

Ev babetên li jorê nivîsandî divê weke xalên rojevê bên formulekirin û ji bo kongreya komeleyê, weke pêşnîyara rojevê bê amadekirin. Kongre divê rojevê minaqeşe bike û dû re tesdîq bike, da ku bikaribe xebata xwe li gora wê bi rê ve bibe. Li gora pirsên ku komele pê mijûl dibin, yan jî li gora girêdanên komeleyan, di kongreyên komeleyan de, hin xalên taybetî yên din jî dikarin têkevin rojeva kongreyê. Bo nimûne; di rojeva kongreya komeleyeke kurdan de, xalên weke "endamîya FKKSyê", "ji endametîya FKKSyê derketin", "polîtîkaya Swêdê ya di warê penaberîyê de " û hwd dikarin hebin.

Komele an kongreya asayî çêdike, an jî ya neasayî.

### 4.1.1. Kongreya asayî

Kongreya asayî bi peryodeke taybetî ku di destûra komeleyê de hatibe diyarkirin (bo nimûne; ji salê carekê, yan ji du salan carekê, yan jî bi peryodeke din) çêdibe û banga wê li gora destûrê tê şandin. Hemû endam dikarin beşdarî kongreyê bibin. Di kongreya asayî de, divê endam li ser babetên ku di rojeva kongreyê de henin, minaqeşeyan bikin û biryarê bidin. Ji bo banga kongreya

asayî, berpirsîyarîya sereke ya komîteya karger e.

Hem kongreya asayî û hem jî ya neasayî bi beşdarîya ji %51ê endaman ve, dibe desthilatdar. Ger di dema kongreyê de, hejmara endamên amade ji vê pîvanê kêmtir be, wê gavê divê kongre di dema ku di destûra komeleyê de hatîye tesbîtkirin (bo nimûne; piştî 15 rojan, mehekê, yan jî demeke din) bicive. Qaîdeya giştî ew e ku cara duyem, li hejmara endamên beşdar nayê nerîn û kongre bi endamên amadebûyî çêdibe.

Komele dikare ji bo amadekirina kongreyê, berî kongreyê komîteyeke taybetî çêbike.

Endamê/a ku dixwaze kongre li ser pêşnîyara wî/wê raweste, divê pêşnîyara xwe berî kongreyê, bi nivîskî bide komîteya karger, da ku têkeve rojeva kongreyê.

Raporên ku divê pêşkêşî kongreyê bibin, ev in:

* Rapora xebatê
* Rapora aborî
* Rapora komîteya çavdêr
* Rapora Komîteya rawêj

Divê her komîteyeke kar rapora xwe berîya kongreyê bi mehekê, pêşkêşî komîteya karger bike. Divê komîteya karger li ser raporan biryarê bide û herweha rapora aborî jî tê de, li gel banga kongreyê, ji endaman re bişîne.

### 4.1.1.1 Vekirina kongreyê

Komîteya karger divê endamên ku di kongreyê de amade nin, bihejmêre, gava ji %51ê endaman di kongreyê de amade bin, kongreyê veke û ancax wê gavê, kongre ji bo biryardayînê dibe desthilatdar.

### 4.1.1.2 Dîwan

Piştî vekirina kongreyê, ji bo birêvebirina kongreyê, dîwanek tê hilbijartin. Endamên dîwanê di nav xwe de, serok, protokolnûs, denghejmêrekî/ê, an jî denghejmêran hilbijêrin.

Divê dîwan:

- Lîsteya endaman li ber destê xwe bihêle.
- Prensîp û disîplîna kongreyê biparêze.
- Rojeva kongreyê pêşkêşî endaman bike û piştî qebûlkirina rojevê, li gora wê, kongreyê bi rê ve bibe.
- Di protokolê de, biryar, guherandina destûrê, navên endamên organan binivîsîne,
- Ji bo karên dahatû pêşnîyaran werbigire.
- Piştî qedandina kongreyê, protokola kongreyê hem bi kurdî û hem jî bi swêdî binivîsîne, îmze bike û di civîna komîteya karger a yekem de, teslîmî komîteya karger bike.

#### 4.1.1.3 Dengdan

Ji bo dengdanê şert ew e ku divê mirov heqê endamîyê dabe. Mafê endamê/a ku heqê endamîya xwe nedabe, tune ye ku beşdarî dengdanê bibe û ew nikare ji bo organan jî bê hilbijartin. Endamê/a ku heqê endamîya xwe nedabe, dikare bi tenê wek mêvanan beşdarî kongreyê bibe.

Prensîp ev e ku her endam xwedîyê/a dengekî ye. Ev prensîpeke demokratîk e.

Divê hem mafê dengdanê û hem jî awayê dengdanê di destûra komeleyê de, bi awayekî zelal hatibin nivîsandin.

Awayê herî baş ew e ku kongre di derheqê pirsên cuda de, bi rêya miqaşeyan bigihêje biryareke hevbeş. Lê hertim bi vî awayî nabe, wê gavê divê dengdan çêbibe. Ger ji bo biryardayinê, qaîde piranîya sade be, wê gavê ji bo ku pêşnîyarek bikaribe bê qebûlkirin, divê ji nêvîyê dengan bêtir dengan werbigire.

### 4.1.2 Kongreya neasayî

Kongreya neasayî li ser bingehê tiştên neasayî çêdibe. Sedemên kongreya neasayî dikarin cuda bin, weke mîsal nakokîyên di navbera organên birêvebir de, daxwaza nisbeteke endaman a taybetî û hwd. Qaîdeya giştî ew e ku şertên kongreya neasayî di destûra komeleyê de tê tesbîtkirin. Ji bo kongreya neasayî, hin

sedem û şertên bingehî dikarin weha bin:.

* Gava nakokî di nav endamên komîteya karger de peyda bibe, an problemek derkeve pêşîya komeleyê ku komîteya karger bi xwe nikaribe wê çareser bike, an piranîya organên komeleyê yên ku di kongreyê de hatinin hilbijartin, ji karê komeleyê bi dûr ketibin û hwd, an jî bi şertê ku komîteya karger bixwaze.

* Gava nisbeteke endaman a taybetî ( ji 1/3ê wan, an piranîya mutleq, an jî nisbeteke din) bi awayê ku di destûra komeleyê de hatibe tesbîtkirin, daxwaz bikin, wê gavê komîteya karger mecbûr e ku kongreya neasayî çêbike.

Ji bo banga kongreya neasayî, di komeleyê de, berpirsîyarîya sereke ya komîteya karger e. Lê, li gora şertên di destûra komeleyê de diyarkirî nin, dikare hin organ, an jî nîsbeteke endaman jî banga kongreya neasayî bikin.

Di kongreyeke neasayî de, endam bi tenê li ser wan pirsan radiwestin ku bûnin sedemên çêkirina kongreyê û di banga kongreyê de hatinin nivîsandin.

## 4.2 Komîteya karger

Komîteya karger di kongreyê de tê hilbijartin. Di navbera du kongreyên komeleyê de, ji bo biryardayîn û birêvebirina kar û barên komeleyê, organa herî bilind û desthilatdar ew e. Yanî, di warê birêvebirina karên komeleyê de, berpirsîyarîya sereke ya wê ye. Di warê hejmara endamên komîteya karger de, tu şertekî qanûnî tune ye. Hejmara endamên komîteya karger li gora mezinbûn, an piçûkbûna komeleyê tê guhertin. Lê hin berpirsîyarî henin ku divê di her komeleyeke endama Federasyonê de hebin;

* Serok

* Sekreter

* Berpirsîyarê/a aborî (Kasor)

Ji derveyî van berpirsîyarîyên sereke, hejmara berpirsîyarîyên din, li gora komeleyan tê guhertin.

Komîteya karger divê li gora xalên destûrê û biryarên kongreyê bixebite. Ji bo komeleyê gelek girîng e ku endamên komîteya

karger çalak bin û pêywendîyên wan ên bi hevdu re baş bin.

Ji derveyî endamên komîteya karger ên esil, divê cîgirên ku di kongreyê de hatibin hilbijartin jî hebin. Divê di destûrê de, hejmara cîgiran hatibe nivîsandin. Cîgirek dikare beşdarî hemû civîn û minaqeşeyan bibe û berpirsîyarîyê werbigire, lê mafê wî/wê yê dengdanê tune ye.

Cîgir dikarin bi du awayan têkevin şûna endamên esil:

1. Cîgirek dikare cîgirê/a endamekî/e esil be û gava endamîya wî/wê biqede, ew cîgir dikeve şûna wî/wê. Gava komeleyê ji bo cîgiran sîstemeke weha qebûl kir, divê bi qasî hejmara endamên esil, cîgiran jî hilbijêre. li Swêdê, ji vî awayê cîgirîyê re, dibêjin; "cîgirîya şexsî".

2. Cîgir li gora dorê dibin esil. Ango, dema ji komîteya karger, endamekî/e esil dev ji berpirsiyarîya xwe berde, îstîfa bike, li gora dorê, cigirê/a yekem dikeve şûna wî/wê û dibe endamê/a esîl.

Ji ber vê yekê, divê di destûrê de, baş bê diyarkirin ku gava endamekî/e esil nema bikaribe endamîya komîteya karger bike, bê komîte dê li gora çi cîgirekî/ê bike endamê/a esil.

Civîna piştî kongreyê ya yekem

Di komîteya karger de, hilbijartin û parvekirina berpirsîyarîyan, divê di civîna piştî kongreyê ya yekem de bên kirin. Xalek heye, girîng e ku divê komele û kongre lê bifikirin û têxin destûrê; ew jî ev e ku berpirsîyarîya komîteya karger a kevin divê heta ku komîteya karger a nuh dest bi karên xwe bike, berdewam be. Heta ku komîteya karger a nuh civîna xwe ya yekem bike û di nav xwe de, berpirsîyarîyan par ve bike, divê komîteya kevin karên komeleyê bi rê ve bibe. Ew ê baştir be ku komîteya nuh û kevin bi hevdu re civîneke hevbeş çêbikin û di wê civînê de berpirsîyarîyan dewrî hevdu bikin.

### 4.2.1 Serok

Divê yek ji endamên komîteya karger, ji bo serokîyê bê hilbijar-

tin. Ev hilbijartin an di kongreyê de çêdibe, an jî piştî kongreyê, di civîna komîteya karger a yekem de çêdibe. Serok di komîteya karger de, berpirsîyarê/a sereke ye. Divê ew çavdêrîyê li çalakîyên komeleyê û xebatên komîteya karger bike. Gelek girîng e ku komîte yekî/a weha bike serok ku di warê pêywendîyên civakî de, jîr û zana be; guh bide daxwazên endaman û gava biryar hat dayin jî ji bo bicîhanîna wê biryarê, bikaribe bi xurtî bixebite.

### 4.2.2 Sekreter

Kesê/a ku bû sekreter, mecbûr e ku li lokala komeleyê gelek caran amade be û divê karên wî/wê nivîsandina protokolan, şandin û anîna posteya komeleyê bin.

Berpirsîyarîyên sekreterî/ê yên sereke ev in:

* Protokolên civînên komîteyê dinivîsîne û -ger di destûrê de hatibe nivîsandin- ji endaman re dişîne.

* Hemû protokolan dixe arşîvê.

* Ji bo nivîsandina protokolan, pêwîst e ku ew di warê bicîhanîn an bicîhneanîna biryarên komîteya karger de, agahdar be.

* Arşîva komeleyê diparêze.

Ji ber ku karê sekreterî/ê bêtir karê nivîsandinê û pêywendîyên bi endaman re ye, divê ew bikaribe xwe hem bi devkî û hem jî bi nivîskî, bi awayekî hêsan îfade bike.

### 4.2.3 Berpirsîyarê/a aborî (kasor)

Yek ji wan berpirsîyarîyên herî girîng, karê kasorîyê ye. Divê kasorê/a komeleyê tevî serokê/a komeleyê lê miqate be, da ku bac û xercên komeleyê di dema xwe de bên dayîn. Gelek girîng e ku divê kesê/a ku ji bo kasorîyê bê hilbijartin, di warê karên aborî de, jîr be û hem ji karên deftergirtin û hesabkirinê û hem jî ji plankirina butçeyê fêhm bike.

Ji bo ku mirov bikaribe pêşîyê li şaşîyan bigire, divê perekişandina bidest, bêyî agahdarîya serokê/a komeleyê nebe. Ji bo kişandina ji hezar kronî zêdetir jî divê biryara komîteya karger pêwîst be.

Berpirsîyarîyên kasorê/a komeleyê;

* Heqê endamîyê kontrol dike û ji bo dana heqê endamîyê, endaman agahdar dike.

* Berpirsîyarê/a miracaeta alîkarîyê ya li ba meqamên dewlet û beledîyeyê ye.

* Deftera hesabên komeleyê digire û divê lê miqate be ku meqbûzên hemû çûyin û hatinan hebin.

* Berpirsîyarê/a dana bac û xercên komeleyê ye.

* Bi hevkarîya endamên komîteya karger di warê butçeya komeleyê ya salane de, pêşnîyarekê amade dike û pêşkêşî komîteya karger dike.

* Hesabên komeleyê yê dawîn çêdike û bi raporekê pêşkêşî kongreyê dike.

Mixabin gelek caran xerckirinên nelirê, deyn û hwd. li komeleyan çêdibin. Ji ber vê yekê, hilbijartina kasorê/a komeleyê pir girîng e. Gava şik peyda bibin ku karê aborî rast nameşe, divê tavilê midaxele bê kirin. Tê dîtin ku mirov di vî warî de, gelek caran pasîv e û ji ber vê yekê jî rewş xerabtir dibe. Ev jî hem zerarê dide komeleyê û hem jî kasorê/a wê.

## 4.3. Komîteya Çavdêr

Di komeleyekê de, gelek girîng e ku mirov bizanibe bê karên aborîyê çawa tê birêvebirin. Ev ne bi tenê ji bo endamên komeleyê, herweha ji bo dezgehên alîkarîyê, beledîye û daîreya bacê jî girîng e.

Îmkan tune ye ku her yek bi serê xwe kontrolê bike. Ji ber vê yekê, kongre ji bo kontrola aborîya komeleyê, komîteyekê hildibijêre. Divê ev komîte bi kêmanî ji sê kesan pêk bê. Ev komîte di navbera du kongreyan de desthilatdar e.

Ji ber ku di komeleyan de, heta nuha sûcên aborî yên giran nehatinin kirin, tu dezgehên dewletê komeleyan mecbûr nakin ku ji derveyî komeleyê, revîsorekî/e resmî bigire.

Herweha yek ji wan berpirsîyarîyên vê komîteyê ew e ku li gel

kontrolkirina hesabên komeleyê, divê hatin û awayê xerckirina pereyên komeleyê jî kontrol bike û rapora xwe bide komîteya karger û kongreyê.

Ev komîte dikare ji bo ji berpirsîyarîyê azadkirin, an neazadkirina komîteya karger, pêşnîyara xwe pêşkêşî kongreyê bike.

### 4.4. Komîteya Rawêj

Li komeleyeke mezin, kongre li gel komîteya karger û komîteya çavdêr, bi navê komîteya rawêj, komîteyekê hildibijêre. Ev komîte di navbera du kongreyan de, li xebat û çalakîyên endaman dinihêre; bi kesên jîr û zana re têkilîyan datîne û bi şertê ku ew qebûl bikin, navên wan ji bo endamîya organan pêşnîyarî kongreyê dike. Rapora komîteya rawêj ji bo kongreyê pêşnîyar e. Ji ber vê yekê, li gel pêşnîyara komîteya rawêj, her endam jî dikare an xwe, an jî endamekî/e din pêşnîyarî organan bike.

## 5. Fînansmana xebatên komeleyan

Yek ji wan xalên xebatên komeleyan yên girîng, fînanskirina xebatên komeleyê ye. Ji bo komeleyên îdeel, prensîpa esasî ew e ku komele bi xwe, tevî endamên xwe bikaribe xebatên xwe fînanse bike, da ku ji alîyê aborî ve tu girêdaneke wê bi cîhekî din re tune be. Ev ji bo paraztina serbixwebûna xebata komeleyê pir girîng e.

Li Swêdê, weke ku berê jî hat behskirin, gelek dezgehên dewletê û yên beledîyeyê alîkarîyê didin komeleyan û piştgirîya wan a aborî dikin. Mebest ji van alîkarîyan ne ew e ku komele bi wan dezgehan ve bên girêdan, an jî li gora armancên wan bixebitin. Ji ber ku alîkarîyên tên kirin, ji butçeya dewletê û ya beledîyeyan ve tên veqetandin ku di esasê xwe de, ji baca ku gel dide, pêk tê. Lê dîsa jî di vî warî de, dîtinên cuda henin û tê gotin ku alîkarîya dewletê û ya beledîyeyan xebatên komeleyan bi sînor dikin û komeleyan bi xwe ve girê dide.

## 5.1 Heqê endamîyê:

Di komeleyeke îdeel de, heqê endamîyê hertim heye û ev ji bo endamîyê şertekî bingehî ye. Heqê endamîyê bingeha fînansmana xebatên komeleyên îdeel e. Ev heq ji alîyê kongreyê ve tê tesbîtkirin û li gora komeleyê tê guhertin. Divê nîsbeta heqê endamîyê li gora hatina endaman, ne giran be. Lê, heqê endamîyê ji bo komeleyekê şert e. Ji ber ku gelek caran pêywendîya heqê endamîyê û wergirtina alîkarîya ji beledîyeyan, an jî ji meclisên wîlayetan bi hevdu re heye. Ango, di dezgehên resmî de, biryarên alîkarîyên ji bo komeleyan, li gora hejmara endamên ku heqên endamîya xwe danin (betalande medlemmar), tên dayîn.

## 5.2 Alîkarî:

Gelek dever henin ku komele dikare ji bo alîkarîyê miracaetî wan bike. Alîkarî carinan pere ye û carinan jî lokal û îmkanên din in. Pirbûna alîkarîyê, li gora mezinbûn û çalakbûna komeleyê tê guhertin. Gava komele hat damezrandin, divê ji bo wergirtina alîkarîyê, pêywendîyê bi beledîyeya xwe re deyne.

Alîkarî û piştgirîyên aborî ku ji alîyê dezgehên dewletê û beledîyeyan ve tên kirin, ev in:

* Alîkarîya kurs û xebatên perwerdeyê (Kurs- och utbildningsbidrag)
* Alîkarîya projeyan (Projektanslag)
* Alîkarîya çalakîyan (Aktivitetsstöd)
* Alîkarîya xebatên çandî (Kulturstöd)
* Alîkarîya xebat û rêxistinê (Verksamhets- och organisationsbidrag)

"Alîkarîya çalakîyan" û "Alîkarîya xebat û rêxistinê" li her beledîyeyê û li her bajarî, piştî şandina miracaetên komeleyan yên salane, ji bo komeleyên ku şertên wergirtina alîkarîyê bi cîh tînin, tên dayîn. li hin cîhan, hin şertên alîkarîyê dikarin cuda bin. Loma jî divê komele bi beledîyeyê re, an jî bi meclisa wîlayetê re pey-

wendîyan deyne û di warê şertên wergirtina van herdu cureyên alîkarîyê de, agahdarîyê werbigire.

Awayên alîkarîyê yên din, bi xebatên cuda ve girêdayî nin û dikarin ji dezgehên neteweyî, an ji ji dezgehên herêmî yên cuda bên wergirtin. Navên hin dezgehan li jêrê hatinin nivîsandin. Lê gelek dezgeh, rêxistin, weqif, an jî daîreyên resmî yên din henin ku divê komele li gora xebat, an jî projeyên ku ew dixwaze bi rê ve bibe, doza alîkarîyê li wan bike.

Yek ji wan cîhên ku divê hemû komeleyên kurdî hevkarîyê pê re bikin, ABF e. Sedema vê yekê ya bingehî ew e ku FKKS di sewîyeya neteweyî de, endama ABFê ye û di navbera wê û ABFê de, peymaneke hevkarîyê ya merkezî heye. Loma jî ji bo komeleyên me feydeyeke mezin tê de heye ku ew bibin endamên ABFê, yan jî peymanên hevkarîyê yên herêmî bi ABFên li herêmên xwe re çêbikin. Di derheqê vê yekê de, agahdarîyên firehtir, di beşê girêdanên FKKSyê de henin.

Wekî din jî gelek deverên din henin ku mirov dikare li ba wan miracaetî alîkarîyê bike.

Hin ji wan ev in:

* Beledîye.

* Birêvebirina Kar û barên sporê (Idrottsförvaltningen), Çalakîyên zarok û ciwanan (Barn och ungdomsverksamhet).

* Birêvebirina entegrasyonê (integrationsförvaltningen), Alîkarîya projeyan, (Projektbidrag), Alîkarîya çalakîyan (verksamhetsbidrag).

* Birêvebirina perwerdeyê (Utbildningsförvaltningen).

* Meclîsa Wîlayetê - Pêşîlêgirtina Aids- Seks û bihevrejîyînê (LAFA- Landstinget förebygga Aids-Sex och Samlevnad).

* Komîsyona Wîlayetê ya Kar (Länsarbetsnämnden).

* Enstîtuya Tendurîstîya Gel (Folkhälsoinstitutet).

* Daîreya Entegrasyonê ya Giştî (Integrationsverket)

* Daîreya serfkaran (Konsumentverket).

* Birêvebirina Ciwanan (Ungdomsstyrelsen).

* Wezareta Kar û barên Derve (UD).
* Enstîtuya Swêdê (Svenska institutet).
* Foruma Başûr a di derheqê welatê paşdemayî de (Forum Syd om u-länder).
* Fonda Bîranîna Olof Palme (Olof Palmes minnesfond).
* Yekîtîya Ewrûpayê- YE (Europeiska unionen- EU).
* Fonda Mîratê ya Giştî (Almänna arvfondet)

Arvfondsdelegationen
Socialdepartementet
103 33 Stockholm

## 5.3 Proje

Proje yek ji wan babetan e ku divê komele girîngîyê bidê. Divê komele hertim hewil bide û projeyan amade bike, da ku bikaribe erkên xwe yên çandî û civakî baştir pêk bîne. Proje li ser mijareke taybetî ye û ji bo maweyeke diyarkirî ye. Her proje ji pêwîstîyekê derdikeve û li ser bingehê fikrekê tê avakirin.

Ji bo projeyê, divê planeke birêkûpêk hebe.

Em li jêrê nimûneyeke lîsteya plana projeyê pêşkêşî we dikin:

Lîsteya plana projeyê

* Navê projeyê

Ger pêywendîya navê projeyê bi naveroka projeyê hebe, dê baştir be.

* Fikra projeyê û sedema wê

Ji bo çi fikreke weha?
Îzaha sedemê

* Mebest

Hûn bi vê projeyê dixwazin çi bikin, çi bînin meydanê?
Armanc
Hûn dixwazin bigihêjin kîjan encamê? Divê encam bi terîmên ku mirov bikaribe bipîve bê nivîsandin.

* Grûpa mijara projeyê

Hûn bi encama projeyê dixwazin xwe bigihînin kê?
* Plankirina demê
Dema destpêk û qedandina projeyê
* Rêxistin
Kî dê beşdarî projeyê bibin? Grûpa projeyê.
Navê berpirsîyarê projeyê.
* Tedbîr
Ji bo ku mirov bi karibe bigihêje armancê û encamê werbigire, divê kîjan tedbîr bêne wergirtin?
* Agahdarî
Ger encama projeyê dê bê belavkirin, ew ê ji bo kê û bi çi awayî be?
* Hesabê projeyê.
Proje bi texmînî dê bi çi qas pereyî bibe mal?
* Dokumentasyon
Rapora projeyê
* Pêşkêşkirin
Encama projeyê dê çawa bê pêşkêşkirin?

## 6. Girêdana komeleyan

Di her civatê de ku azadîya bi awayê komeleyan ve, xwebirêxistinkirinê lê hebe, komele li gora armanc û qada xebatên xwe, di sewîyeya herêmî, neteweyî, yan jî navneteweyî de, hin girêdanên rêxistinî çêdikin.

Armanc ji van girêdanên di sewîyeyên cuda de, ew e ku her komeleyek bikaribe bi komeleyên hevarmanc yên din re li ser wan pirsên ku pê mijûl dibin, dengê xwe hîn xurttir bikin û li ser çareserkirina wan pirsan, tesîrên xwe zêdetir bikin. Weke mîsal, mirov dikare komeleyên jinan, komeleyên ji bo aştîyê, sendîkayên karker û karmendan, komeleyên kirêdaran, komeleyên penaber û biyanîyan, komeleyên kêmendaman (seqetan), komeleyên perwerdeyê û hwd, ji bo girêdanên herêmî, neteweyî û navneteweyî nîşan bide. Komîteyên Aştîyê, LO, TCO, SAF, ABF, HSO, FKKS nimûneyên van girêdanên di sewîyeya neteweyî (riksnivå) de

nin.

Kurdên li Swêdê dimînin jî ji bo ku dengên xwe li ser pirsên ku ji bo hemû kurdên penaber hevbeş in, ne bi tenê li bajarên ku lê dimînin, lê bi kurdên din yên ku li tevahîya Swêdê dimînin re bikin yek û bi awayekî xurt bidin bihîstin, di meha Gulana 1981ê de, Federasyona Komeleyên Kurdistanê Li Swêdê (FKKS) ava kir. Ji ber vê yekê, FKKS di navbera komeleyên kurdên rûnuştevanên Swêdê de, girêdaneke rêxistinî ya azad e.

Li welatekî weke Swêdê, pirsên kurdan ên hevbeş, ew pirs in ku bi penaberîya me û bi nasnameya me ya neteweyî ve girêdayî nin. Pirsên ku li ser bingehê van herdu xalan, rojane derdikevin pêşîya me ku sedem û encamên wan hemû kurdan eleqedar dikin û tesîrê li jiyana wan dikin, ji bo girêdana komeleyên kurdan a rêxistinî, di bin sîwana FKKSyê de, ev zemîna hevbeş peyda kirîye. Loma jî FKKS girêdaneke kurdên li Swêdê ya azad û rêxistineke wan a demokratîk a sembola pirs û armancên wan ên hevbeş e.

# FKKS
# AVAHÎYA WÊ
# Û
# GIRÊDANA
# WÊ YA
# BI KOMELEYÊN ENDAM RE

# 7. Kurtedîrok/ armanc û avahîya FKKSyê

## 7.1. Dîroka avakirina Federasyonê

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê (FKKS) di meha Gulana 1981ê de hat damezirandin. Wê demê, hem hejmara kurdên ku li Swêdê diman, kêm bûn û hem jî deverên ku ew lê bi cîh bûbûn, ne ew qasî zêde bûn.

Xebata avakirina FKKSyê di sala 1979an de, di navbera şeş komeleyên kurd de, dest pê kir ku li bajarên Stockholmê û Uppsalayê hatibûn damezirandin. Komeleyên ku dest bi xebata avakirina FKKSyê kir, ji alîyê avahî û girêdanên xwe ve, ne mîna komeleyên me yên nuha bûn. Her şeş komeleyên ku FKKS ava kir, di bin tesîra hêzên siyasî yên cuda de bûn û endamên wan jî ji alîgirên hêzên siyasî yên wê demê pêk dihatin. Ji wan, pênc komele li Stockholmê qeyidkirî bûn û ya din jî li Uppsalayê bû. Endamên wan jî bi tenê ji kurdên rûniştevanên van herdu bajaran pêk dihatin.

Avakirina FKKSyê, pêwîstîyeke siyasî bû û ev bi saya lihevkirina komeleyên bi ser hêzên siyasî yên cuda ve pêk hat. Loma jî mirov dikare bibêje ku destpêka avakirina FKKSyê, ji bo hêzên siyasî yên di komeleyên avakarên FKKSyê de serdest bûn, weke platformeke hevbeş derket ortê. Li gel vê yekê, rewşa siyasî ya li Swêdê û maf û îmkanên di warê xebatên komeleyan de hebûn jî ji bo amadekirna şertên avakirina Federasyonê tesîreke girîng kirîye û roleke erênî leyiztîye.

Di ser vakirina FKKSyê re, bîst sal derbas bûn û di van bîst salan de, di armanc û avahîya FKKSyê de, gelek guherandin çêbûnin. Ev guherandin hertim di kongreyên FKKSyê de, bi biryar û dengên endamên FKKSyê ve pêk hatinin.

Lê, du xalên armancên FKKSyê henin ku ji dema avabûna wê û heta îroj her manin. Ev herdu xal bingehê pêwîstî û hebûna FKKSyê diyar dikin. Yek ji wan xalên armancên FKKSyê, "temsîlkirina kurdên Swêdê " ye û ya din jî " li tevahîya Kurdistanê, piştgirîya tevgera gelê kurd ya neteweyî û demokratîk " e. Ev herdu xal jî di maweya bîst salan de, hatinin şirovekirin û di xalên arman-

cên FKKSyê de, bi formulasyonên cuda hatinin parastin.

Weke hat behskirin, avahîya FKKSyê di salên derbasbûyî de, bi tecrube û minaqeşeyên ku bi awa û pêvajoyeke demokratîk çêbûn, hatîye guherandin. Guherandina bingehî di sala 1986an de çêbû û FKKS ji wê rojê ve, xebata xwe li ser vê avahîya xwe ya nû didomîne. Ev guherandin bi biryara 15 komeleyên endam ên ku wê demê bi ser hêzên Kurdistanê yên siyasî ve bûn, pêk hat. Li gora vê guherandinê, FKKS ji komeleyên kurd ku li beledîyeyên cuda hatinin avakirin, pêk tê û prensîpa esasî ew e ku divê li her beledîyeyekê, bi tenê komeleyeke endam hebe.

## 7.2 Armanca FKKSyê

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê yekîtîya armanc û xebatên komeleyên kurd temsîl dike. Federasyon rêxistineke kurdên Swêdê ya kurdistanî, demokratîk, civakî û kulturî ye. Navenda wê li Stockholmê ye. Ew ji alîyê Hikûmeta Swêdê ve resmî hatîye qebûlkirin û alîkarîyê jê werdigire. Ev alîkarî ne alîkarîyeke taybetî ku bi tenê ji bo FKKSyê ye. Ev li Swêdê, ji bo her awayê xebatên komeleyan, wek beşekî mafên demokratîk tê hesibandin û ji bo hemû federasyonên biyanî yên bi avahî, xebat û hejmarên endamên xwe ve şertên wergirtina alîkarîyê pêk tînin, tê pêşkêşkirin.

Federasyon li gel komeleyên endamên xwe, ji bo pêkanîna daxwazên kurdên Swêdê û çareserkirina pirsên kulturî dixebite. li Swêdê, parastin û pêşvebirina mafên demokratîk, yek ji wan erkên FKKSyê yên girîng e. Her weha FKKS ji bo ku gelê kurd bikaribe li tevahîya Kurdistanê bibe xwedîyê maf û azadîyên xwe yên neteweyî û demokratîk, piştgirîya têkoşîna gelê kurd weke erkeke xwe ya bingehî dizane û di warê kirinên dagirkerên Kurdistanê yên li dijî gelê kurd de, rûniştevanên Swêdê agahdar dike û hewil dide ku ji bo doza neteweyî piştgirîyê werbigire.

Mirov dikare mebesta yekkirina komeleyên kurd ya di bin sîwana Federasyonê de, di van xalan de rêz bike:

* Pêywendîyên civata kurd li Swêdê xurttir bibin.

* Komele di derheqê çalakîyên hevdu de bêtir agahdar bibin.
* Ji tecrubeyên hevdu istîfade bikin.
* Beşdarî çalakîyên hevdu bibin.
* Bi hevdu re çalakîyên hevbeş organîze bikin.
* Di kongreyên Federasyonê de, bi awayekî demokratîk bi hevdu re biryaran bidin.
* Sînorên ku Kurdistan perçe kirîye û kurd ji hevdu bi dûr xistinin, di xebatên xwe yên hevbeş de rakin.
* Bi hevdu re li dijî zilm û nîjadperestîyê kar bikin.
* Ji bo parastina nasnameya neteweyê kurd, bi hevdu re têbikoşin.
* Li gel rêxistinên swêdî yên demokratîk hevkarîyê bikin.
* Li gora peymanên navneteweyî, ji bo penaberên kurd bixebitin.
* Bi rêya çapemenîyê dengê xwe bigihînin gelê Swêdê.

Komeleyên kurd li Swêdê ji bo van armancan û ji ber gelek sedemên din, di bin sîwana Federasyonê de kom bûnin. Federasyon li navendê, temsîla wan dike û her komeleyeke endam li bajarê xwe temsîla Federasyonê dike. Yanî her bajarê ku komeleyeke endam lê hebe, Federasyon jî lê heye.

## 7.3 Avahîya FKKSyê

Avahîya FKKSyê weke ku di destpêkê de hat behskirin, ji komeleyên endam pêk tê ku ji alîyê kurdan ve li beledîyeyên cuda hatinin avakirin. Li gel vê, yekîtîyên meslekî û civakî yên ku xebatên xwe li seranserê Swêdê bi rê ve dibin jî dikarin bibin endamên Federasyonê. Avahîya FKKSyê li ser bingeh û prensîpên demokratîk hatîye danîn ku mirov bi maf û berpirsîyarîyên wekhev beşdarî xebat û pêvajoya biryardayîna li ser armanc, avahî û xebatên wê dibe.

## Endamîya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê

Endamîya FKKSyê bi biryara komeleyên ku dixwazin bibin en-

dam û organên di warê qebûlkirina endamîyê de desthilatdar in, çêdibe. Ango, endamîya FKKSyê bi îradeya komeleyên ku dixwazin bibin endam û bi şertê ku ew destûra FKKSyê qebûl bikin pêk tê. Qebûlkirina destûra FKKSyê, tê wê mahneyê ku komele bi armancên FKKSyê re ye û ji bo pêkanîna şertên endamîya xwe, amade ye ku heqê endamîya xwe bide û beşdarî xebatên FKKSyê bibe.

Ji bo ku komeleyeke kurd bikaribe bibe endama Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê û ji alîyê wê ve bê qebûlkirin, divê endamîya wê komeleyê, bêyî ku li ferqa siyasî, dînî û hwd bê nerîn, ji bo hemû kurdên ji her alîyên kurdistanê vekirî be.

Komeleyên li Beledîyeyan

Komeleyên li beledîyeyan hatinin damezrandin, bingehê avahî û endamîya FKKSyê pêk tînin û qadên xebatên wan, beledîyeyên wan û beledîyeyên cîran in ku komeleyên kurd yên endamên FKKSyê lê tune nin.

Prensîpa esasî ew e ku li her beledîyeyeke kurd lê dijîn, bi tenê komeleyek hebe ku hemû kurdên li wê beledîyeyê bikaribin bibin endamên wê komeleyê û bi tenê komeleyek bibe endama FKKSyê. Mebesta bingehî ya ji vê prensîpê ew e ku heta ku mumkun be, mirov xebatên kurdên li Swêdê yên demokratîk bike yek, di navbera kurdan de zemînên xebata demokratîk ya hevbeş xurt bike û bêyî ku li dîtinên siyasî, ferqên civakî û hwd bê nihêrin, wan tevî xebatên demokratîk yên yekgirtî bike. Li gel vê prensîpa esasî jî organên desthilatdar dikarin li gora hin şertên taybetî, endamîya du komeleyên li eynî beledîyeyê, yan jî li eynî bajarî qebûl bikin. Yek ji wan şertên taybetî ew e ku heger ew beledîye weke beledîyeya Stockholmê, beledîyeyeke mezin be û komeleyek bi tenê nikaribe hemû kurdan û xebatên wan ên demokratîk himbêz bike, wê gavê ji komeleyekê bêtir komele dikarin bibin endamên FKKSyê.

## Komeleyên / Yekîtîyên meslekî

Di civata kurdan de jî weke her civateke din, meslek, berjewen-

dî yan jî daxwazên cuda henin û ev yek ji bo civata kurd li Swêdê jî derbas dibe. Ev rewşa ha, pêwistîya rêxistinên cuda jî derdixîne ortê. Loma jî li Swêdê hin kurdên ku xwedîyên meslek û hinerên cuda nin, xwedîyên pirsên cuda nin, li ser hevbeşîya meslek an jî hinerê xwe, xwe bi rêxistin kirîye. Bo nimûne; Yekîtîya Hiqûqnasan, Komeleya Nivîskaran û hwd.

Ji ber ku mebesta avakirina FKKSyê, yekkirina xebat, îrade û daxwazên kurdên li Swêdê yên demokratîk e, bo nimûne; ji bo ku komeleyên meslekî bikaribin di kongreya Federasyonê de, bên temsîlkirin, hin rêyên taybetî ku şertên endamî û beşdarîya wan hêsantir dikin, hatînin peydakirin. Ev yek hem ji bo civata kurd bi giştî û hem jî ji bo FKKSyê xurtbûn û pêşveçûnek e.

## Komeleyên / Yekîtîyên civakî

Weke di hemû civatên din de jî xuya dibe, jin û ciwan bi hin taybetîyên xwe ve xwedîyên pirsên cuda nin. Ev rewşa ha, ji bo çareserkirina van pirsan pêwistîya avahî û xebatên taybetî çêdike. Civata kurd li Swêdê di vî warî de, gavên girîng avêtinin û van herdu alîyên/kategorîyên civata me yên girîng, rêxistinên xwe ava kirinin.

Di warê xebatên van herdu kategorîyên civata me yên rêxistinî de, tevî hemû kêmanî û dîtinên cuda, dîsa jî li Swêdê, avakirina rêxistinên jin û ciwanên kurd û berdewamîya xebata wan ji bo avahîya FKKSyê, bûyereke gelek girîng e.

Di 1987an de, Yekîtîya Ciwanên Kurd li Swêdê hat damezrandin û di 1992yan de jî Yekîtîya Jinên Kurdistanê li Swêdê ava bû. FKKS di çêbûna van herdu yekîtîyan de, xwedîya roleke girîng e û her weha ev ji bo civata me pêşketinek e ku ev herdu alîyên civata me ya li Swêdê yên girîng bi rêxistin bûn û di xebatên me yên rêxistinî yên demokratîk de, cîhên xwe girtin.

Yekîtîya Ciwanên Kurd li Swêdê û Yekîtîya Jinên Kurdistanê li Swêdê ji jin û ciwanên endamên komeleyên FKKSyê pêk tên. Herdu yekîtî jî divê xebatên jin û ciwanên kurd yên li komeleyên endamên FKKSyê bikin yek û her weha her komeleyeke endam

ji bo ku avahîyên van herdu yekîtîyan xurttir bibin, da ku bikaribin xebatên xwe hîn firehtir û bi hêztir bikin, divê di warê avakirina seksîyonên jin û ciwanan de bibe alîkar. Li her komeleyeke endam, xurtbûna xebatên jin û ciwanên kurd dê hem xebatên komeleyên endam geştir bike, hem FKKSyê xurttir bike û hem jî ji bo civata kurd li Swêdê, bibe garantîya berdewamîya yekîtîya xebatên demokratîk.

## Organên FKKSyê

Di kar û barên FKKSyê de, ji bo berpirsîyarî û desthilatdarîyê, organên cuda henin. Berpirsîyarî û desthilatdarîya organên FKKSyê jî weke her rêxistineke din, di destûra FKKSyê de hatinin diyarkirin. Destûra FKKSyê ji bo endam û birêvebirên karên FKKSyê, weke qanûnê ye û ev qanûn jî ne ji alîyê hin kesên ji derveyî FKKSyê ve, lê ji alîyê nûnerên komeleyên endamên FKKSyê ve tê tesbîtkirin. Loma jî hem xwendin û zanîna maf û berpirsîyarîyên endam û organên FKKSyê yên hilbijartî û hem jî pêkanîna wan, ji bo biserketina birêvebirin û beşdarîya kar û barên komeleyan, şertên esasî nin. Organên ku di xebatên FKKSyê de, xwedîyên maf û berpirsîyarîyan in, hin organên hilbijartî û hin jî organên destnîşankirî (tayînkirî) nin. Mebest ji organên hilbijartî ew e ku ev organ li hember kongreya FKKSyê, bi awayên cuda berpirsîyar in û îskeleta xebatên FKKSyê pêk tînin. Organên destnîşankirî jî ew organ in ku ji bo hin karên li gora pêwîstîyê derdikevin holê, ji alîyê organên hilbijartî ve tên destnîşankirin.

## Organên FKKSyê yên hilbijartî

Organên FKKSyê yên hilbijartî, li gora dora desthilatdarîya biryardayînê, ev in:

1. Kongre
2. Komîteya Giştî (KG)
3. Komîteya Karger (KK)
4. Komîteya Çavdêr (KÇ)
5. Komîteya Rawêj (KR)

Kongre ji alîyê desthilatdarîyê ve, organa FKKSyê ya herî bilind e. Ji ber ku FKKS yekîtîya komeleyên kurd li Swêdê ye, organa wê ya herî desthilatdar ji nûnerên komeleyên endam ên hilbijartî pêk tê. Her komele li gora prensîpa wekhevîya temsîlê, nûnerên xwe tesbît dike û vê organa FKKSyê ya herî desthilatdar derdixîne ortê. Loma jî divê Kongreya FKKSyê jî weke organeke hilbijartî bê dîtin û ji bo xebatên civata kurd li Swêdê yên demokratîk, weke îradeya giştî ya yekgirtî bê hesibandin û nirxandin.

Berpirsiyarî, maf û birêvebirina karên FKKSyê û organên wê yên hilbijartî di destûra wê de hatinin diyarkirin. Ji ber ku destûr bi tenê di kongreyan de dikare bê guherandin, girîng e ku dema komeleyên endam ji hin organ, armanc yan jî awayên xebatên FKKSyê ne razî bin, yan jî di van waran de kêmanîyan bibînin, divê bi awayekî aktîf beşdarî kongreyên FKKSyê bibin û ji bo guherandinan hewil bidin. Lê divê heta ku guherandin çênebin, rêza destûra FKKSyê bê girtin, da ku berdewamîya vê zemîna xebatên civata kurd li Swêdê ya hevbeş, misogertir bibe.

## Komên xebatê û desthilata wan.

Xebatên FKKSyê ji gelek qad û babetên cuda pêk tên. Hemû jî xwedîyên taybetîyên cuda nin û loma jî ji bo ku xebatên di van qad û babetan de, bi serketî bin, pêwîstî bi komên xebatê heye. Organên FKKSyê li gora pêwîstîyê, dikarin komên xebatê tayîn bikin. Awayên xebata wan û berpirsîyarîyên wan ji alîyê organên hilbijartî ve tên dîyarkirin. Lê endamên di van koman de berpirsîyarîyê werbigirin, divê di qad û babetên xwe de, pispor bin. Û herweha divê neyê ji bîr kirin ku her komên xebatê di karê xwe de, li hember organên hilbijartî berpirsiyar e û divê xebata xwe li gora biryarên organên FKKSyê bi rê ve bibe. Ji ber ku li hember kongreya FKKSyê, bi tenê organên di kongreya FKKSyê de hatinin hilbijartin, berpirsiyar in. Ev yek jî li gora prensîpên xebata demokratîk tê wê mahneyê ku bi tenê organên berpirsiyar dikarin biryarê bidin. Yên ku divê di kongreyê de, mihasebeya xebatên xwe bidin, organên FKKSyê yên hilbijartî nin, ne organên tayînki-

rî nin.

Li gel vê yekê jî komên xebatê di kar û barên FKKSyê de, xwedîyên rolên girîng in. Pirsa mafê biryardayîn û berpirsiyarîyê, divê nebe sedemên ku mirov girîngîya komên xebatê nebîne, yan jî kêm bike.

## 7.4 Aborîya FKKSyê

Weke her komeleyeke îdeel, divê aborîya FKKSyê jî li ser bingehê heqê endamîyê û hatinên ji xebatên FKKSyê pêk bê. Lê weke ku destpêkê de jî hatibû diyarkirin, taybetîyên jiyana komeleyatî ya li Swêdê û îmkanên ku civat bi xwe ji bo xebatê komeleyan amade dike, di aborîya FKKSyê de jî xwe nîşan didin.

Ji dema ku Daîreya Kar û Barên Biyanîyan (SIV) - navê wê nuha bûye Integratonsverket - qebûl kir ku FKKS rêxistineke di sewîyeya neteweyî de ku mafdarê wergirtina alîkarîya dewletê ye, ji %90ê aborîya FKKSyê, ji alîkarîya vê daîreya dewletê pêk tê. Ev rewş ji bo tevahîya Federasyonên biyanîyan weha ye. Lê weke ku berê jî hatibû behskirin, alîkarîya dewletê bi hejmara endamîyê ve û bi îsbatkirina dayîna heqê endamîyê ve girêdayî ye. Heger di kontrolên daîreyên desthilatdar de derkeve ortê ku endamên FKKSyê heqên endamîya xwe nedanin, wê gavê, alîkarî bi tenê li gora nîsbeta hejmara endamên ku heqên endamîya xwe danin, tê dayîn. Loma jî divê her komeleyeke endam her sal, heqê endamîya xwe di dema xwe de, bişîne û divê ev yek di qeyidên deftera FKKSyê ya aborî de, xuya bibe.

Ji bilî heqê endamîyê û alîkarîya dewletê ya li gora hejmara endamên ku heqên endamîya xwe danin, aborîya FKKSyê ji projeyên ku ji bo xebatên cuda tên amadekirin, pêk tê. Mihasebeya alîkarîya ku ji bo projeyan tên wergirtin, divê di dema tesbîtkirî de, ji bo wan dezgehan bê pêşkêşkirin ku pereyên alîkarîya projeyan ji wan hatinin wergirtin.

Her weha divê bê zanîn; alîkarîya ku dewlet li gora hejmara endamên ku heqên endamîya xwe danin, dide, bi tenê ji bo xebatên FKKSyê yên navendî ye, ne ji bo xebatên komeleyan e. Di qa-

îdeyên xerckirina alîkarîya dewletê de, pir bi zelalî tê diyarkirin ku ew alîkarî bi tenê ji bo xebatên rêxistina alîkarîwergir ên navendî ye. Di vî warî de jî gelek caran şaştêgihiştinek heye ku di nav FKKSyê de, dibe sedema minaqeşe û nakokîyên nepêwîst. Loma jî pêwist e ku divê komeleyên endam xwe û endamên xwe di vî warî de, baş agahdar bikin.

## 7.5 Prensîpên maf û berpirsiyarîyên FKKSyê li hember komeleyên endam û yên komeleyên endam li hember FKKSyê

### 7.5.1 Maf û berpirsiyarîyên FKKSyê li hember komeleyên endam

Federasyon û komeleyên xwe ji bo armancên hevbeş têdikoşin. Ji ber vê yekê, yek bê ya din nabe. Ger komele nebin, tu mahneyeke Federasyonê jî namîne; ger Federasyon nebe, yekîtîya xebatê pêk nayê. Çalakbûna her yekê ji wan, tesîra xwe raste rast li ser ya din dike.

Her federasyoneke bîyanîyan ya li Swêdê, di welatê xwe de, xwedî dewlet e û li Swêdê jî sefaretên dewletên wan henin. Beşek ji karên siyasî, civakî û kulturî ji xwe, ji alîyê van sefaretan ve tê kirin. Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ji penaberên neteweyekî perçekirî ku ji welatekî dabeşkirî tên, pêk hatîye. Ew bi saya piştgirîya endamên xwe, erkên xwe bi cîh tîne û li hember endamên xwe û kurdên rûniştevanên Swêdê berpirsîyar e.

**Federasyon divê:**

* Di nav komeleyan de, çi li qada herêmî, çi jî li seranserê Swêdê, kurs, semîner û civînan pêk bîne.

* Komeleyan ziyaret bike.

* Çalakîyên komeleyan di Berbangê de biweşîne û her carê komeleyeke endam bide nasandin.

* Beşdarî kongreyên komeleyan bibe.

* Gava pêwîst be, alîkarîya komeleyan bike û ji bo çareserkirina problemên wan hewil bide.

* Bi şertê ku karên wan ne li dijî armancên Federasyonê bin, midaxeleyî wan neke û divê her komele di karê xwe de azad be.

* Ji bo xurtkirina komeleyan hewil bide û Berbangê ji endamên komeleyên endam re belaş bişîne.

* Ji bo organîzekirina xebatên hevbeş ji komeleyên endam yên nêzî hevdu, komîteyên herêmî pêk bîne.

Mixabin hin komele henin ku endamîya xwe ya Federasyonê bi tenê ji bo mebestên aborîyê bi kar tînin. Divê ji bo me pir eşkere be ku Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê rêxistineke alîkarîwergir e û li gora qanûnan, ew nikare alîkarîyê bide. Her komeleyeke endam jî li gora xebatên xwe û hejmara endamên xwe, alîkarîyê li bajarê xwe werdigire û divê ew wê alîkarîyê li çalakîyên xwe xerc bike.

## 7.5.2 Maf û berpirsiyarîya komeleyan li hember FKKSyê

Me got ku xurtbûn an jî qelsbûna komeleyên endam tesîra xwe raste rast li çalakbûna Federasyonê dike. Divê bê gotin ku gelek komeleyên Federasyonê yên xurt û bi tecrube nin, lê tecrubeyên hin komeleyên endam jî kêm in. Di pêvajoya xebatên komeleyan de, hat dîtin ku hin endamên komeleyan karên civakî û kulturî didin alîyekî û xebatên sîyasî derdixin pêş. Vê yekê ji bo Federasyonê û komeleyên endam gelek problem çêkirin û serbixwebûna komeleyên endam xist talûkeyê. Ji bo ku ev bûyer dîsa çênebin, pêwîst e ku komeleyên endam xwe dûrî helwestên grûpî bikin. Mebest bi vê yekê ne ew e ku endamên komeleyekê nikarin beşdarî karên sîyasî bibin û bibin endamên rêxistinên sîyasî. Mebest bi tenê ev e ku gava ew hatin nav komeleyê, divê ew li gora destûra komeleyê bixebitin. Li derveyî komeleyê, herkes di bîr û rayên xwe de azad e.

Bi vî awayî, hem rêza karên endamên komeleyê yên sîyasî tê

girtin û hem jî serbixwebûna komeleyê tê paraztin.

Divê komeleyeke endam di vê çarçoveyê de;
* Beşdarî çalakîyên Federasyonê yên giştî bibe.
* Bersiva name û daxwazên Federasyonê bide.
* Di xebatên herêmî de çalak bin, rexne, pêşnîyar û dîtinên xwe bigihîne Federasyonê.
* Gava kongreya xwe çêbike, nûnerên Federasyonê dawet bike.
* Nûnerên xwe bişîne kongreya Federasyonê.
* Di warê çalakîyên xwe de, agahdarîyan ji Berbangê re bişîne.
* Ji bo xurtkirina Federayonê hewil bide.
* Xwe ji dijîtîyên sîyasî bi dûr bixe û destûrê nede ku dijîtîyên sîyasî bên nav komeleyê.
* Heqê endamîya xwe bişîne Federasyonê. Ji bo vê jî pêwîst e ku hersal li gora sala malî, yanî di 01.01- 30.12 an de, heqê endamîya xwe bişîne postgîroya Federasyonê.

Ji ber ku hin komeleyên endam di 1996an de, heqên endamîya xwe neşandibûn, Federasyonê nikarîbû ji bo maweya salekê, alîkarîya temam werbigirta. Ev jî bû sedema krîzeke mezin. Ji bo ev kêmanî dîsa çênebe, pêwîst e ku komîteyên komeleyên endam ên karger li ser şandina heqê endamîyê, bi awayekî cidî rawestin.

Gava di qeyida deftera aborî de, diyar bibe ku endamên komeleya li beledîyeyekê, yan jî li bajarekî, heqên endamîya xwe nedabin, bê ew komele çawa ji alîkarîya ku civatê ji bo karên komeleyetîyê veqetandîye, dê nikaribe îstîfade bike, herweha ger komeleyên endamên FKKSyê jî bi şandina heqên endamîya xwe ve girêdana xwe ya bi FKKSyê îsbat nekin, wê gavê, FKKS jî nikare ji alikarîya civata Swêdê îstîfade bike ku ji bo karên navendî yên li çaroveya Swêdê tên kirin, tê dayîn. Ango, heqê endamîyê îsbatkirina endamîyê ye û ev yek ji bo FKKSyê jî derbas dibe.

Ger komeleyek endamîya xwe ya salane nede, li gora destûra

Federasyonê, mafê nûnerên wê tune ye ku di kongreya Federasyonê de deng bidin.

## 7.6 Girêdanên FKKSyê yên di sewîyeyên neteweyî û navneteweyî de

FKKS ji bo gihaştina armancên xwe yên di destûrê de, hatinin destnîşankirin, bi hin rêxistinên biyanî yên din û swêdîyan re hevkarîyeke birêxistinî dike. Ji bilî vê hevkarîyê û danûstandinên demî ku li gora pêwistîyên xebatê derdikevin holê, FKKS endamên van herdu rêxistinan e: SIOS, ABF.

### 1. SIOS

SIOS (Organa Hevkarîya Rêxistinên Biyanîyan li Swêdê) ji 15 Federasyonên biyanîyan pêk tê û di dawîya salên 80yî de hatîye avakirin. SIOS di derheqê pirsên biyanîyan yên hevbeş ( Bo nimûne; mafê kar, penaberîyê, siyaseta întegrasyonê û hwd) de, berdevkîya helwestên van rêxistinan yên hevbeş dike. Ji salê carekê, kongreya xwe çêdike û her ji salekê carekê, federasyoneke biyanî ya endama SIOSê, bi dorê dibe seroka SIOSê. FKKS ji sala 1996an ve endama SIOSê ya esil e.

### 2. ABF

ABF (Arbetarrörelsens Bildningsförbund - Yekîtîya Tevgera Karkeran a Perwerdeyê), li Swêdê yek ji wan mezintirîn yekîtîyên îdeel ên perwerdeyê (studieförbund) ye. Dîrokeke wê ya kevin heye û xebateke çand û perwerdeya gel a berfireh dike. Piştî ku FKKSyê bi ABFê re gelek salan, hevkarîyeke pir nêzîk kir, nuha bûye endama wê. Hevkarîya FKKS û ABFê ya di warê perwerde û xebatên kulturî de, roj bi roj firehtir dibe. Loma jî girîng e ku komeleyên endamên FKKSyê jî di sewîyeya herêmî de, bi ABFê re danûstendin û hevkarîyên xwe xurttir bikin û pêşdetir bibin.

Ji bilî van hevkarîyên FKKSyê yên bi rêxistinên Swêdê re, danûstandinên FKKSyê li Ewrûpayê, bi rêxistinên kurdan ên hevar-

manc re hertim xurt bûnin û hewildanên ji bo di sewîyeya Ewrûpayê de, di navbera rêxistinên kurdan ên demokratîk de, zemîneke hevbeş bê avakirin, hertim di rojeva xebatên FKKSyê de, cîhekî girîng wergirtîye. Hin konferansên ku ji alîyê FKKSyê ve hatin amadekirin, di vî warî de gavên hêja bûn, lê ji ber sedemên cuda, heta nuha jî hîn tu encam nehatîye wergirtin.

## 7.7 Dawî/encam

Di vê buroşurê de, li ser xebatên komeleyan û FKKSyê agahdarîyên kurt hatinin amadekirin. Divê neyê jibîrkirin ku di civakeke weke civaka Swêdê de ku di warê komeleyên îdeel de, xwedîya dîrokeke girîng û jiyaneke berfireh e, gelek agahdarî, pirtûk û materyalên din henin ku ji tecrubeyên jiyana komeleyetî yên cuda, agahdarîyên girîng tên amadekirin û pêşkêşkirin. Loma jî dê baş be ku li her komeleyeke endam, ji bo karên perwerdeya di warê xebatên komeleyan de, hewildanên berdewam hebin û divê ew ji agahdarîyên bi zimanê swêdî jî îstîfade bikin. Ji bo jiyan û xebatên kurdan ên komeleyetîyê bi serketî bin, divê ev hewildan hertim di rojeva komeleyan de bin.

Çavkanî û pirtûkên referens yên bi zimanê swêdî ku mirov dikare di warê xebatên komeleyan de, îstîfadeyê ji wan bike:

*Folkrörelse och Föreningsguider (Ges ut av inrikesdepartementet, beställning Fritzes Kundtjänst 106 47 Stockholm, Fax: 08-20 50 21, tfn. 08-690 90 90)

چەندان ساڵ هاوکاریی نزیک لەگەڵ ئەم ڕێکخراوەدا، ئێستا ئەندامی (ABF)ە. لە بواری پەروەردە و کاری کولتورییدا هاوکاریی ڕۆژانەی لەگەڵدا هەیە. زۆر گرنگە کۆمەڵەکانی ئەندامی فیدراسیۆن لە ئاستی هەرێمەکاندا پەیوەندیی و هاوکاریی لەگەڵ لقەکانی (ABF) بەهێزتر بکەن.

جگە لە هاوکاریی فیدراسیۆن لەگەڵ ڕێکخراوەکانی سوید، پەیوەندیی فیدراسیۆن بە ڕێکخراوە هاوئامانجەکانی کورد لە ئاستی ئەوروپادا هەردەم بەهێزتر دەبێ و فیدراسیۆن هەوڵ دەدات بە هاوکاریی ڕێکخراوە دیموکراتییەکانی کورد لە ئەوروپادا، ناوەندێکی دیموکراتیی بۆ کوردەکانی دانیشتووی ئەوروپا دامەزرێنێ. لەم بوارەدا فیدراسیۆن هەنگاوی باشی هەڵگرتووە و کۆنفرانسێکیشی پێکهێناوە، بەڵام تا ئێستا هەوڵەکانی نەگەیشتوونەتە ئەنجام.

### ٧,٧ کۆتایی/ ئەنجام :

لەم نامیلکەیەدا بە کورتیی لەسەر کاری فیدراسیۆن و کۆمەڵەکان ئاگادارمان کردن، بەڵام دەبێ ئەوە لەبیر نەکەین کە لە کۆمەڵگایەکی وەک کۆمەڵگای سوییدا، کە خاوەنی مێژوویەکی گرنگ و بەرفراوانە لە کار و خەباتی کۆمەڵەکانی ئیدیالدا، مرۆڤ دەتوانێ گەلێک لەوە زیاتر زانیاریی لەسەر کاری کۆمەڵە پەیدا بکات. هەروەها کتێب و نوسراوی زۆر هەیە کە بە زمانی سادەی سویدیی نوسراون و لە ئەزمون و ژیانی جیاوازی کۆمەڵایەتی دەدوێن و ئاگاداریی گرنگیان تێدایە. بۆ ئەوەی کۆمەڵەکان لە کارەکانیاندا پتر سەرکەون، پێویستە بەردەوام بن لە خوێندنەوەی ئەو کتێبانەدا و بۆ پەروەردە کردنی ئەندامانیان سودیان لێ وەرگرن. بۆ سەرکەوتنی کورد لە ژیان و خەباتی کۆمەڵایەتیدا لە سوید، پێویستە ئەو هەوڵدانە بە بەردەوامیی لە بەرنامەی کاری کۆمەڵەکاندا بگونجێنرێ.

## ٦,٧ گرێدان و بەستراوەیی فیدراسیۆن لەسەر ئاستی نەتەوەیی و نێونەتەوەییدا :

فیدراسیۆن بۆ گەیشتن بەو ئامانجانەی لە پرۆگرامەکەیدا تۆمار کراون، لەگەڵ هەندێ ڕێکخستنی سویدیی و بێگانەدا هاوکاریی ڕێکخراوەیی دەکات. ئەو شێوە هاوکارییانە لە مەیدانی کارکردندا خۆ زەق دەکەنەوە و فیدراسیۆن بە هاوبەشیی کاریان بۆ دەکات.

**١. ئۆرگانی هاوکاریی ڕێکخستنەکانی بێگانە لە سوید (SIOS) :**

ئۆرگانی هاوکاریی ڕێکخستنەکانی بێگانە (SIOS) لە کۆتایی هەشتاکاندا دامەزراوە و ئەمڕۆ پانزدە فیدراسیۆنی بیانی تیایدا ئەندامە. (SIOS) دەربارەی کێشەکانی هاوبەشی وەک مافی کار، پەنابەریی سیاسی و ئینتێگراشون و... هتد هەڵوێستی هاوبەشی ڕێکخستنەکان دەردەبڕێ. ساڵیی جارێک کۆنگرە دەبەستێ. سەرۆکایەتی (SIOS) هەر ساڵەی بە نۆرە لە لایەن نوێنەری فیدراسیۆنێکەوە بەڕێوە دەچێ. فیدراسیۆنی ئێمە لە ساڵی ١٩٩٦ەوە ئەندامی (SIOS) ە.

**٢. یەکێتی پەروەردەی بزاڤی کرێکاران (ABF) :**

یەکێتی پەروەردە کردنی بزاڤی کرێکاران (ABF)، یەکێتییەکی هەرە مەزن و ئیدیالیی سویدە. خاوەن مێژوورییەکی کۆن و کارێکی پەروەردەیی و کولتوریی فراوانە. فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید دوای

- بانگهێشتنی نوێنەری فیدراسیۆن بکات بۆ بەشداریی کردنی لە کۆنگرەی کۆمەڵەدا.

- چالاکییەکانی خۆی بۆ بەربانگ بنێرێ.

- خۆی لە دژایەتی سیاسی دوور ڕابگرێ.

- مافی ئەندامەتی ساڵانەی بۆ فیدراسیۆن ڕەوانە بکات.

چونکە هەندێ لە کۆمەڵەکانی ئەندام ساڵی ١٩٩٦ مافی ئەندامەتی خۆیان بە فیدراسیۆن نەدابوو، فیدراسیۆن نەیتوانی لە ساڵی ١٩٩٩دا بە تەواویی، یارمەتی ساڵانە وەربگرێ، ئەوەش خەریک بوو قەیرانێکی مەزن پێک بێنێ، کە چارەسەر کرا. بۆ ئەوەی ئەو کەمترخەمییە جارێکی تر ڕوو نەداتەوە کۆمیتەی کارگێڕی کۆمەڵەکان دەبێ مافی ئەندامەتی کۆمەڵەکەیان لە کاتی دیاریکراودا ڕەوانەی فیدراسیۆن بکەن.

هەر وەک کۆمەڵە ناتوانێ سود لە یارمەتی تەرخانکراوی کۆمەڵایەتی شارەوانیی شارەکەی وەربگرێ، ئەگەر مافی ئەندامەتی ئەندامانی لە دەفتەری ئابوری کۆمەڵەدا تۆمار نەکرابێ، فیدراسیۆنیش ناتوانێ سود لە یارمەتی کۆمەڵگای سوید وەربگرێ ئەگەر کۆمەڵەکان مافی ئەندامەتی خۆیان بۆ ڕەوانە نەکردبێ. هەروەها ئەگەر کۆمەڵەیەک مافی ئەندامەتی ساڵانەی خۆی نەدات، بە گوێرەی پێڕەوی ناوخۆی فیدراسیۆن، نوێنەرانی ئەو کۆمەڵەیە مافی نوێنەرایەتی ودەنگدانیان لە کۆنگرەی فیدراسیۆندا نیە.

### ٧. ٥. ٢ ماف و بەرپرسایەتی كۆمەڵەكانی ئەندام بەرانبەر بە فیدراسیۆن :

وتمان بەهێزبوون و كزبوونی كۆمەڵەكانی ئەندام راستەوخۆ كار دەكاتە سەر فیدراسیۆن. دەبێ بوترێ كە زۆربەی كۆمەڵەكانی ئەندامی فیدراسیۆن خاوەن ئەزمونن، بەڵام كۆمەڵەش هەیە كە لە بەڕێوەبردنی كارەكانیدا ئەزمونێكی زۆری وەرنەگرتووە. لە خەباتی هەندێ كۆمەڵەی ئەندامدا دیاردەیەكی سەرنج راكێش دەكەوێتە بەرچاو، ئەویش ئەوەیە كە جار هەیە كاری كۆمەلایەتی و كولتوریی وەلا دەنێن و كاری سیاسی پێش دەخەن. ئەو كارە گەلێك كێشەی بۆ فیدراسیۆن و كۆمەڵەكانی دروست كردووە و سەربەخۆیی كۆمەڵەكانی خستووەتە مەترسییەوە. بۆ ئەوەی ئەم بارە جارێكی تر سەرهەڵنەداتەوە، پێویستە كۆمەڵەكانی ئەندام خۆیان لە هەڵوێستی گروپیی دوور راگرن. لێرەدا مەبەست ئەوە نیە كە ئەندامی كۆمەڵەكان بەشداریی خەباتی سیاسی نەكەن یان مافیان نەبێ، ببن بە ئەندامی رێكخراوێكی سیاسی، بەڵكو مەبەست ئەوەیە كە بوونە ئەندامی كۆمەڵەكان بە گوێرەی پەیرەو و پرۆگرامی كۆمەڵەكەیان كار بكەن و لە دەرەوەی كۆمەڵەشدا هەركەس ئازادە لە بەرەوەپێشەوە بردنی بیر و رێبازی خۆیدا. بەو شێوەیە، لە لایەك رێز لە كاری سیاسی ئەندامانی كۆمەڵە دەگیرێ و لە لایەكی تریشەوە سەربەخۆیی كۆمەڵەش دەپارێزرێ. كۆمەڵەی ئەندام لەم چوارچێوەیەدا دەبێ :

- بەشداریی چالاكییە گشتیەكانی فیدراسیۆن بكات.
- وەڵامی نامە و داخوازییەكانی فیدراسیۆن بداتەوە.
- لە كاری هەرێمییدا چالاك بێ و رەخنە و پێشنیار و بۆچوونەكانی بگەیەنێتە فیدراسیۆن.

- لە ناو کۆمەڵەکاندا چ لە ئاستی هەرێمیی و چ لە سەرانسەری سویددا کۆرس و سیمینار و کۆبوونەوە ساز بکات.
- سەردانی کۆمەڵەکان بکات.
- چالاکیی کۆمەڵەکان لە بەربانگدا بڵاو بکاتەوە و هەر جارەی کۆمەڵەیەک بە خوێنەران بناسێنێ.
- بەشداریی کۆنگرەی کۆمەڵەکان بکات.
- کاتی پێویست هاوکاریی کۆمەڵەکان بکات بۆ چارەسەرکردنی ئەو کێشانەی روو بە ڕوویان دەبنەوە.
- هەر کۆمەڵەیەک لە کاروباری خۆیدا ئازادە. ئەگەر کارەکانیان دژی ئامانجی فیدراسیۆن نەبێ، فیدراسیۆن دەست لە کاروباری کۆمەڵەکان وەرنادات.
- بۆ بەهێزکردنی کۆمەڵەکان، هەوڵ بدات بە خۆڕایی بەربانگ بۆ ئەندامانی ڕەوانە بکات.
- بۆ ڕێکخستنی کاری هاوبەش لە نێوان کۆمەڵەکانی نزیک بەیەکدا، کۆمیتەی هەرێم پێک بێنێ.

بەداخەوە هەندێ کۆمەڵە تەنیا بە مەبەستی وەرگرتنی یارمەتی ئابوری دەبنە ئەندامی فیدراسیۆن. دەبێ بۆ ئێمە زۆر ئاشکرا بێ کە فیدراسیۆن ڕێکخراوێکە یارمەتی وەردەگرێ و بە یارمەتی دەژی، بۆیە بەپێی یاسای سوید، نابێ یارمەتی ئابوری بە کۆمەڵەکانی بدات. کۆمەڵەکانی ئەندام دەتوانن بۆ بەڕێوەبردنی کارەکانیان لە شارەوانییەکانی خۆیان یارمەتی وەربگرن.

یارمەتییە تەنیا بۆ بەڕێوەبردنی کاروباری ناوەندی ڕێکخستنە. زۆر جار بە هەڵە لەو بابەتە دەگەن و بۆ ئەوەی لە ناو فیدراسیۆندا ڕێگا لەبەر گفتوگۆ و ناکۆکیی بێ سود بگیرێ، کۆمەڵەکانی ئەندام پێویستە لەسەر ئەم جۆرە بابەتانە، ئەندامانیان ئاگادار بکەنەوە.

## ٥٫٧ پرینسیپەکانی ماف و بەرپرسیاریەکانی فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی ئەندام لە بەرامبەر یەکتردا

**٧. ٥. ١ ماف و بەرپرسایەتی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان بەرامبەر بە کۆمەڵەکانی ئەندام :**

فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی ئەندام بۆ ئامانجی هاوبەش تێدەکۆشن. بۆیە بێ یەکتر نابن. ئەگەر کۆمەڵە نەبێ، بوونی فیدراسیۆنیش مانای نیە، ئەگەر فیدراسیۆنیش نەبێ، یەکێتی کار لە نێوان کۆمەڵەکاندا پێک نایەت. چالاکیی هەر یەک لەوانە کاریگەریی ڕاستەوخۆی هەیە لەسەر ئەوی تریان.

هەموو فیدراسیۆنەکانی بێگانە لە سوید، لە وڵاتی خۆیاندا خاوەن دەوڵەتن و لە سویدیش باڵوێزخانەیان هەیە و بەشێک لە کاری سیاسی و کۆمەڵایەتی و کولتوریی ئەو نەتەوانە لە لایەن باڵوێزخانەکانیانەوە بەڕێوە دەچێ. فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید لە پەنابەرانی نەتەوەیەکی پارچەکراوی وڵاتێکی دابەشکراو پێکهاتووە. بە پشتگیریی ئەندامانی ئەرکەکانی خۆی جێبەجێ دەکات و لە بەرامبەر ئەندامەکانی و کوردەکانی دانیشتووی سویددا خۆی بە بەرپرسیار دەزانێ. بۆ ئەم مەبەستەش فیدراسیۆن دەبێ:

**٧. ٤ ئابوریی فیدراسیۆن :**

ئابوری فیدراسیۆن وەکوو هەر کۆمەڵەیەکی ئیدیال لەسەر بنەمای مافی ئەندامەتی و داهاتی کاری فیدراسیۆن پێکدێ. وەک لە سەرەتادا باسکراوە، تایبەتمەندیی ژیانی کۆمەڵایەتی لە سوید و ئەو دەرەتانەی یاسای سوید بۆ کاری کۆمەڵەکان دەرەخسێنێ، لە ئابوری فیدراسیۆنیشدا دێتە بەرچاو. لەو کاتەوە بەڕێوەبەرایەتی کاروباری بێگانە (SIV) لە سوید، کە ئێستا ناوی گۆڕاوە بووەتە بەڕێوەبەرایەتی تێکەڵاویی (Integrationsverket)، فیدراسیۆنی وەک ڕێکخستنێک لە ئاستی نەتەوەییدا قبوڵ کردووە و مافی وەرگرتنی یارمەتی دەوڵەتیی پێ داوە. ٩٠٪ ئابوری فیدراسیۆن لە یارمەتی دەزگاکانی حکومەتیی پێکدێ، ئەوەش هەموو فیدراسیۆنەکانی بێگانە لە سوید دەگرێتەوە، بەڵام هەروەکوو پێشتر ئاماژەی بۆ کراوە، ئەو یارمەتییە، بەندە بە ژمارەی ئەندام و مسۆگەر کردنی دانی مافی ئەندامەتی لە لایەن کۆمەڵەکانی ئەندامەوە. ئەگەر لە پشکنینی دەزگا دەسەڵاتدارەکان دەرکەوێ کە هەموو کۆمەڵەکانی ئەندامی فیدراسیۆن مافی ئەندامەتی خۆیان نەداوە، یارمەتییەکە تەنیا بە گوێرەی ئەو ئەندامانە دەدرێت کە مافی ئەندامەتییان داوە. بۆیە هەر کۆمەڵەیەکی ئەندام پێویستە ساڵانە لە کاتی خۆیدا (١/١ هەتا ١٢/٣٠) مافی ئەندامەتی خۆی ڕەوانەی فیدراسیۆن بکات تا لە دەفتەری ئابوری فیدراسیۆندا تۆمار بکرێ.

جگە لە مافی ئەندامەتی و یارمەتی حکومەت کە بەپێی ژمارەی ئەندام و مافی ئەندامەتی دەدرێ، ئابوری فیدراسیۆن لە پێشکەش کردن و بەڕێوەبردنی پرۆژەی جیاواز دابین دەکرێ. حساباتی ئەو یارمەتییەی کە بۆ بەڕێوەبردنی پرۆژە وەردەگیرێ دەبێ بە ڕونی دیاری بکرێ و ئاراستەی ئەو دەزگایانە بکرێتەوە کە یارمەتی پرۆژەکەیان داوە. هەروەها دەبێ بزانین کە ئەو یارمەتییەی کە بە گوێرەی کۆ کردنەوەی مافی ئەندامەتی دەدرێ، تەنیا بۆ کاری مەڵبەندی ناوەندی فیدراسیۆنە نەک بۆ کاری کۆمەڵەکان. لە ڕێنمای شێوەی خەرجکردنی یارمەتی حکومەتییدا زۆر بە ڕونی هاتووە کە ئەو

هەندێ ئۆرگان یان ئامانج و شێوەی کار و پەیڕەو و پرۆگرامی فیدراسیۆن ڕازیی نەبێ، یان کەموکوڕیی لە هەندێ بەشی دا ببینێ، پێویستە چالاکانە بەشداریی کۆنگرەی فیدراسیۆن بکات و بۆ سەلماندنی بیروڕای خۆی و گۆڕانکاریی هەوڵ بدات، بەڵام تا ئەو گۆڕانکارییانە ڕوو دەدەن، دەبێ ڕێز لە پەیڕەو و پرۆگرامی فیدراسیۆن بگرێ و ببێتە زەمینەی هاوبەشی خەباتی کۆمەڵایەتی کورد لە چوارچێوەی فیدراسیۆن و لە سویددا.

**گروپی کار و دەسەڵات** : کاری فیدراسیۆن لە زۆر شێوە و بابەتی جیاواز پێکدێ، هەر شێوە و بابەتێکی جیاواز، خاوەن تایبەتمەندیی جیاوازە. بۆ ئەوەی کارەکانی سەرکەوتووانە ئەنجام بدرێن، پێویستی بە گروپ و کۆمیتەی جیاوازی کار هەیە. ئۆرگانە بەرپرسەکانی فیدراسیۆن کە لە کۆنگرەدا هەڵدەبژێررێن، بە گوێرەی پێویست دەتوانن گروپی کار دامەزرێنن. ئەو گروپانە دەبێ لە شێوە و بابەتی کاری خۆیاندا خاوەنی زانیاریی بن. نابێ ئەوەش لەبیر بکەین کە هەر گروپێکی کار لە کارەکانیاندا لە بەرامبەر ئۆرگانە هەڵبژێرراوەکاندا بەرپرسیارن و دەبێ کارەکانیان بە گوێرەی بڕیاری ئۆرگانەکانیان بەڕێوە بەرن.

ئەوەش یەکێکە لە پرینسیپەکانی کاری دیموکراتی. بەو واتەیە کە تەنیا ئۆرگانە بەرپرسیارەکان خاوەن بڕیارن و ئەوانەی مافی لێپرسینەوەیان هەیە لە کارەکاندا، تەنیا ئۆرگانە هەڵبژێرراوەکانی کۆنگرەن نەک گروپە دروستکراوەکان. لەگەڵ ئەوەشدا گروپی کار لە کاروباری ڕۆژانە و پرۆگرامی فیدراسیۆندا گرنگییان هەیە. مافی بڕیاردان و بەرپرسایەتی، نابێ ببێتە هۆی کەم کردنەوەی گرنگیی گروپەکانی کار.

یەکێتی لاوانی کورد و یەکێتی ژنانی کوردستان لە سوید، لە ئەندامانی لاو و ژنانی کۆمەڵەکانی ئەندامی فیدراسیۆن پێکدێن. هەردوو یەکێتی دەبێ کاری لاوان و ژنانی کورد لە کۆمەڵەکانی ئەندامی فیدراسیۆندا یەکخەن، هەروەها هەر کۆمەڵەیەکی ئەندام بۆ ئەوەی ستروکتوری ئەو دوو یەکێتی یە بەهێزتر بێ و بتوانن خەباتی خۆیان بەهێزتر و فراوانتر بکەن، بۆ دامەزراندنی لقی لاوان و ژنان یارمەتیدەر بن. بەهێز بوونی خەباتی ژنان و لاوان لە هەر کۆمەڵەیەکدا، کۆمەڵەکەش و فیدراسیۆنیش بەهێز دەکات و بەردەوام بوونی یەکێتی کاری دیموکراتی کۆمەڵگای کورد لە سوید دەسەلمێنن.

**ئۆرگانەکانی فیدراسیۆن:**

١- کۆنگرە
٢- کۆمیتەی گشتی
٣- کۆمیتەی کارگێڕ
٤- کۆمیتەی چاودێر
٥- کۆمیتەی ڕاوێژ

کۆنگرەی فیدراسیۆن ئۆرگانی هەرە بەرز و دەسەلاتداری فیدراسیۆنە و لە نوێنەرانی هەڵبژێرراوی کۆمەڵەکانی ئەندام پێکدێ. هەر کۆمەڵەیەک بە گوێرەی پرینسیپی یەکسان نوێنەر بۆ کۆنگرەی فیدراسیۆن دیاریی دەکات و لەو نوێنەرانە ئۆرگانی هەرە دەسەلاتداری فیدراسیۆن پێکدێ. لەبەر ئەوە، کۆنگرەی فیدراسیۆن وەک ئۆرگانێکی هەڵبژێرراو و دەربڕی ویستی گشتیی و یەکگرتووی خەباتی دیموکراتی کۆمەڵگای کوردەواری لە سوید تەماشا دەکرێ و هەڵدەسەنگێنرێ.

ئەرک و بەرپرسایەتی و شێوەی بەڕێوەبەرایەتی کار و خەباتی فیدراسیۆن و ئۆرگانەکانی لە پەیڕەو و پرۆگرامەکەیدا دیاریی کراوە. لەبەر ئەوە پەیڕەو و پرۆگرامی فیدراسۆن تەنیا لە کۆنگرەدا پەسەند دەکرێ و کۆنگرە دەتوانێ ئالوگۆڕی تیادا پێک بێنێ. ئەگەر کۆمەڵەیەکی ئەندام لە

**کۆمەڵەکان و یەکێتییەکان** : لە کـۆمـەڵگای کـوردەواریدا وەک هەر کۆمەڵگایەکی تر، پیشە و بەرژەوەندی جیاواز هەیە، ئەو دیاردەیە، کۆمەڵگای کوردی سویدیش دەگرێتەوە، ئەوەش وادەکات کە ڕێکخستنی جیاجیا پەیدا بێت، بۆ نمونە، هەندێ لەو کوردانەی لە سویدن خاوەنی پیشـە و هونەر و کێشەی جیاواز و هاوبەشن و پێویستیان بە ڕێکخستنی تایبەت بە خۆیان هەیە، وەک: یاسا زان، مافپەروەر، نووسەر و ...هتد.

چونکە مەبەست لە دامەزراندنی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کودستانییەکان یەکخستنی خەبات و ویستی و داخوازیی دیموکراتیی کوردەکانی سویدە، بۆیە فـیـدراسـیـۆن بە هەندێ مـەرجی تایبـەتیی بۆ نموونە شـێـوەی بەشدارییکردنیان لە کۆنگرەی فیدراسیۆندا، دەرگای بۆ بە ئەندام وەرگرتن و بەشداریی کردنی ئەو کۆمەڵانە لە خەباتی هاوبەشدا کردووەتەوە. ئەمەش هەم بە کۆمەڵگای کوردی سوید بە گشتیی و هەم بە فیدراسیۆن و کۆمەڵەکان هێز و توانا دەبەخشێ و بەرەوپێشەوەیان دەبات.

**کۆمەڵەکان و یەکێتی کۆمەڵایەتی** : ژنان و لاوان وەک هەر توێژێکی تر تایبەتمەندیی و پرس و داخوازیی جیاوازی خۆیان هەیە. بۆ چارەسەرکردنی ئەو پرس و داخوازییانەی کە سەرهەڵدەدەن، خەباتی تایبەتی پێویستە. کۆمەڵگای کورد لە سوید لەم بوارەدا هەنگاوی گرنگی بۆ ڕێکخستنی ئەم دوو لایەنە هەڵگرتووە و ئەمڕۆ ژنان و لاوان ڕێکخستنی تایبەت بە خۆیان دامەزراندووە.

دامەزراندن و بەردەوام بوونی کاری ڕێکخستنی ژنان و لاوانی کورد لە سوید، ئەرکی گرنگی فیدراسیۆنە. لە ساڵی ۱۹۸۷دا یەکێتی لاوانی کورد لە سوید و ساڵی ۱۹۹۲ یەکێتی ژنانی کوردستان لە سوید دامەزران. لە دامەزراندنی ئەو دوو ڕێکخراوەدا فیدراسیۆن ڕۆڵێکی گرنگی گێڕا، هەروەها ڕێکخستن و بەشداریکردنی ئەو دوو لایەنە گرنگەی کۆمەڵگای کورد لە سوید لە کار و خەباتی دیموکراتیدا، پێشکەوتنی کۆمەڵگای ئێمەیە.

**ئەندامەتی لە فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکاندا لە سوید** : ئەندام بوون لە فیدراسیۆندا بە بڕیاری ئەو کۆمەڵانەیە کە دەیانەوێ ببنە ئەندام و هەروەها بڕیاری ئەو ئۆرگانانەی کە دەسەڵاتی ئەندام وەرگرتنیان هەیە. واتە ئەندام بوون لە فیدراسیۆندا بە ویستی ئازادی ئەو کۆمەڵانەیە کە دەیانەوێ ببنە ئەندام، بە مەرجێک کە پەیڕەو و پرۆگرامی فیدراسیۆن قبوڵ بکەن.

قبوڵ کردنی پەیڕەو و پرۆگرامی فیدراسیۆن ئەوە دەگەیەنێ کە کۆمەڵە لەگەڵ ئامانجەکانی فیدراسیۆنە و ئامادەیە مەرجی ئەندامەتی بەجێ بگەیەنێ و مافی ئەندامەتی بدات و بەشداریی بکات لە کاروخەباتی فیدراسیۆندا. بۆ ئەوەی کۆمەڵەیەکی کوردیی بتوانێ ببێتە ئەندامی فیدراسیۆن و لەلایەن فیدراسیۆنیشەوە قبوڵ بکرێ، دەبێ ئەندامەتی لەو کۆمەڵەیەدا بەبێ لەبەرچاو گرتنی شێوەی بیرکردنەوەی سیاسی و ئایینی جیاواز بێ و کۆمەڵە دەبێ دەرگای بۆ کوردی هەموو پارچەیەکی کوردستان کراوە بێ.

**کۆمەڵەکان لە شارەوانیەکاندا** : پرینسیپی بنەڕەتیی فیدراسیۆن ئەوەیە کە لە هەر شارەوانییەکدا تەنیا کۆمەڵەیەکی کوردیی هەبێ و هەموو کوردەکان بتوانن ببنە ئەندامی و لە هەر شارەوانییەکیشدا تەنیا یەک کۆمەڵە بە ئەندام وەرگرێ. مەبەست لەو پرینسیپەش ئەوەیە کە هەموو کوردەکانی دانیشتوی شارەکانی سوید یەک بگرن و زەمینەی خەباتی دیموکراتیی پێکەوە بەهێز بکەن و بەبێ لەبەر چاوگرتنی بیروبۆچوونی سیاسی و کۆمەڵایەتی، پێکەوە بەشداریی خەباتی دیموکراتیی بکەن.

لەگەڵ ئەو پرینسیپە سەرەکییەشدا، دیسان بە گوێرەی هەندێ مەرجی تایبەتیی، ئۆرگانە دەسەڵاتدارەکانی فیدراسیۆن دەتوانن ئەندامەتی دوو کۆمەڵە لە یەک شارەوانی و لە یەک شاردا قبوڵ بکەن. یەکێک لەو مەرجە تایبەتییانە ئەوەیە کە کۆمەڵە لە شارەوانیەکی گەورەی وەک ستۆکهۆڵم کە نەتوانێ خەباتی دیموکراتیی هەموو کورد لە ئامێز بگرێ، دەتوانێ لە یەک کۆمەڵە پتر هەبێ و بە ئەندامی فیدراسیۆنیش دەتوانێ بە گوێرەی پێویست لەوێ کۆمەڵە بە ئەندام وەرگیرێ.

- پەیوەندیی کۆمەڵگای کوردیی لە سوید بەهێزتر بێ.
- کۆمەڵەکان دەربارەی چالاکیی یەکتر پتر ئاگادارییان هەبێ.
- لە ئەزمونی یەکتر سود وەربگرن.
- بەشداریی چالاکیی هاوبەش بکەن.
- پێکەوە چالاکیی ڕێکبخەن.
- لە کۆنگرەکانی فیدراسیۆندا بە شێوەیەکی دیموکراتیی پێکەوە هەڵوێست وەرگرن.
- ئەو سنورانەی کە کوردستانیان پارچە پارچە کردووە و کوردیان لێک دور خستووەتەوە، لە چوارچێوەی خەباتی هاوبەشدا ببەزێنن.
- پێکەوە دژی ستەم و ڕەگەزپەرستیی کار بکەن.
- بۆ پاراستنی ناسنامەی نەتەوەیی کورد پێکەوە تێبکۆشن.
- لەگەڵ ڕێکخراوە دیموکراتییەکانی سویددا هاوکاریی بکەن.
- بە گوێرەی پەیمانە نێونەتەوەییەکان بۆ پەنابەرانی کورد خەبات بکەن.

کۆمەڵە کوردییەکان لە سوید لەبەر ڕۆشنایی ئەو ئامانجانە و گەلێک هۆی تر لە ژێر چەتری فیدراسیۆندا کۆ بوونەتەوە. فیدراسیۆن لە ناوەند نوێنەرایەتی ئەوان دەکات و لە هەر جێیەکیش کە کۆمەڵەی ئەندام هەبێ بوونی فیدراسیۆن دەسەلمێنێ، واتە لەوێ فیدراسیۆن هەیە.

### ٣,٧ دامەزرانی فیدراسیۆن :

هەروەک لە سەرەتادا باسکرا، فیدراسیۆن لەو کۆمەڵانە پێکهاتووە کە بەهۆی کوردەکانەوە لە شارەوانییە جیاوازەکانی سویددا دامەزراون. هەروەها فیدراسیۆن لە کۆمەڵە پیشەیی و کۆمەڵایەتییەکانی کوردی سەرانسەری سوید پێک دێ و بەڕێوە دەچێ.

ستروکتوری فیدراسیۆن لەسەر بنەما و پرینسیپی دیموکراتیک و ماف و بەرپرسایەتی یەکسان و بەشداریی کردنی خەبات و بڕیار وەرگرتنی هاوبەش دەربارەی ئامانج و شێوەی خەباتی دواڕۆژ پێکدێ.

## ٧. ٢ ئامانجی فیدراسیۆن:

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان لە سوید ڕێکخستنێکی کوردستانیی، دیموکراتیی، کۆمەڵایەتی و کولتوریی کوردەکانی سویدە. ناوەندەکەی لە ستۆکهۆڵمە و نوێنەرایەتی یەکێتی ئامانج و خەباتی هاوبەش و هاوئاهەنگیی کۆمەڵە کوردییەکان دەکات. فیدراسیۆن لە لایەن حکومەتی سویدەوە بە ڕەسمیی ناسراوە و یارمەتی دەدرێ. ئەو یارمەتییە تەنیا بۆ فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان نیە، بەڵکو بۆ هەموو فیدراسیۆنەکانی بێگانەیە. یارمەتی وەرگرتنی فیدراسیۆنەکان پەیوەستە بە ژمارەی ئەندام و کار و خەباتیانەوە و بەشێکی گرنگە لە مافی دیموکراتیی وڵاتی سوید، کە بۆ خەباتی کۆمەڵەکان تەرخان کراوە.

فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی ئەندامی بۆ بە ئەنجام گەیاندنی کار و خەباتی کۆمەڵایەتی و کولتوریی و چارەسەر کردنی داخوازەکانیان خەبات دەکەن. پاراستن و بەرەوپێشەوە بردنی مافی دیموکراتیی لە سوید یەکێکە لە ئەرکە گرنگەکانی فیدراسیۆن. هەروەها، فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان بۆ مافی نەتەوەیی و دیموکراتیی گەلی کورد لە سەرانسەری کوردستاندا هەوڵ دەدات و خەبات لە دژی داگیرکەران بە ئەرکی سەرەکیی خۆی دەزانێ و لەسەر کێشەی کورد ئاگاداریی دەدات بە دانیشتوانی سوید و بۆ پشتگیریی کردن لە دۆزی نەتەوەیی کورد تێدەکۆشێ. مرۆڤ دەتوانێ هۆی کۆبوونەوەی کۆمەڵە کوردییەکان لە ژێر چەتری فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکاندا لەو چەند خاڵانەی خوارەوەدا ببینێ:

مەبەست لە دامەزراندنی فیدراسیۆن لە لایەن ئەو کۆمەڵانەوە، دەگەڕایەوە سەر هۆکاری سیاسی و هاوئاهەنگیی سیاسی پارتە سیاسییە جیاوازەکان. بۆیە مرۆڤ دەتوانێ بڵێ فیدراسیۆن وەک پلاتفۆرمێکی هاوبەش بۆ خەبات و کاری سیاسی لە نێوان ئەو کۆمەڵانەدا دامەزراوە. لەگەڵ ئەوەشدا لە سوید هەلومەرجی سیاسی بۆ کار و خەباتی کۆمەڵە و هاوئاهەنگیی خەباتی هاوبەش لە نێوانیاندا، ڕۆڵێکی گرنگ و کاریگەری هەبوو لە دامەزراندنی فیدراسیۆندا.

لەو بیست ساڵەی بەسەر دامەزراندنی فیدراسیۆندا تێپەڕیوە، گۆڕانێکی زۆر لە ئامانج و شێوەی بەڕێوەبردنی کارەکانیدا ڕووی داوە. ئەو گۆڕانکاریانە لە کۆنگرەکانی فیدراسیۆندا بە دەنگی ئەندامانی نوێنەری فیدراسیۆن ئەنجام یان گرتووە، بەڵام دوو خاڵ هەیە لە ئامانجەکانی فیدراسیۆندا کە لە ڕۆژی دامەزراندنیەوە هەتا ئەمڕۆ وەک خۆی پارێزراون. ئەو دوو خاڵە بنەمای پێویست لە بوونی فیدراسیۆن پێک دێنن.

یەکێک لەو خاڵانە ئامانجی فیدراسیۆن «نوێنەرایەتی کردنی کوردی سویدە» و ئەوی تریش «پشتگیریی کردنیەتی لە بزاڤی نەتەوەیی و دیموکراتیی گەلی کوردە لە سەرانسەری کوردستاندا». ئەو دوو خاڵە بە درێژایی ساڵانی ڕابردوو، شیی کراونەتەوە و بە شێوەی جیاواز گەڵاڵە کراون، بەڵام بوونی خۆیان لە ئامانجی فیدراسیۆندا پاراستووە.

وەک باسکرا لە ساڵانی ڕابردوودا فیدراسیۆن بە ئەزموون وەرگرتن لە خەبات و ڕێبازی دیموکراتیی لە گفتوگۆی ئاشکرادا، گۆڕانی بەسەردا هاتووە. گۆڕانکاریی بنەڕەتیی لە ساڵی ١٩٨٥ ڕوویدا. فیدراسیۆن لەو کاتەوە تا ئێستا بەو شێوەیە درێژەی بە خەباتی خۆی داوە. ئەو گۆڕانکارییە بە گوێرەی بڕیاری ئەو چەند کۆمەڵەیە ئەنجامی گرت، کە ئەندامی هێزە سیاسییەکانی کوردستان بوون و فیدراسیۆنیان پێکهێنا بوو. فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان ئەمڕۆ لەو کۆمەڵە کوردییانە پێکهاتووە، کە کوردی شارەوانییە جیاوازەکان لە سوید، پێکیان هێناوە.

# بەشی دووەم

## ٧. فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان : دامەزران و پەیوەندیی بە کۆمەلەکانی ئەندامەوە

### ٧. ١ کورتەیەکی مێژوویی دەربارەی ئامانج و دامەزراندنی فیدراسیۆن :

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە مانگی ئایار (گوڵان)ی ١٩٨١دا دامەزرا، ئەوکات ژمارەی کورد لە سوید کەم بوو و شوێنی نیشتەجێ بوونیان بە بەراورد کردن لەگەڵ ئەمڕۆ دیاردەیەکی بەرچاو نەبوو.
کار بۆ دامەزراندنی فیدراسیۆن لە ساڵی ١٩٧٩دا بەهۆی شەش کۆمەڵەوە لە ستۆکهۆڵم و ئوپسالا دەستی پێکرد. ئەو کۆمەڵانەی یەکەم هەنگاویان بۆ دامەزراندنی پەیوەندییەکانیان لە چوارچێوەیەکی بەرینتر هەڵگرت، ئەو کۆمەڵانە سەرەتا گرێدراوی فیدراسیۆن نەبوون و بە چەند ڕێکخراوی سیاسیی جیاواز لە هەرێمی جیاوازی کوردستان بەسترابوونەوە و ئەندام و لایەنگر و دۆستی ڕێکخراوە سیاسییەکان بوون. پێنج کۆمەڵەیان لە ستۆکهۆڵم و ئەویتریان لە ئوپسالا ناونوس کرابوو، بەڵام ئەندامی ئەو کۆمەڵانە، تەنیا کوردەکانی ئەو شارانە نەبوون کە کۆمەڵەیان تێدا دامەزرابوو.

فیدراسیۆن (FKKS) گرێدانێکی ئازادی کۆمەڵە کوردییەکانە لە سویددا.

ئەو دیاردانەی کوردەکانی تێدا هاوبەشن، بابەتی پەنابەران و ناسنامەی نەتەوەییە. ئەو کێشانەی پەیوەندییان بەو دوو خاڵەوە هەیە، ڕۆژانەییە و هۆ و ئەنجامەکانیان پەیوەندیی و کاریگەرییان هەیە لەسەر ژیانی هەموو کوردەکان و زەمینەی پەیوەندیی و ڕێکخستنی هاوبەشی کۆمەڵە کوردییەکانە کە لە ژێر چەتری فیدراسیۆندا کۆ بوونەوە. هەر بۆیە فیدراسیۆن گرێدراوێکی ڕێکخستنی ئازاد و هێمای پرس و ئامانجی هاوبەشی کوردەکانی سویدە.

- ڕێکخستن : بەڕێوەبەرانی پرۆژەکە کێن ؟
- ئاگاداری : ئەگەر ئەنجامی پرۆژەکە بڵاوکرایەوە، بۆ کێ و بە چ شێوەیەک دەبێ؟
- پارەی پێویستی پرۆژە : پرۆژەکە بە خەملاندنی چەند پارەی دەوێ ؟
- بەڵگەنامەکان : ڕاپۆرتی پرۆژە
- پێشکەش کردن : ئەنجامی پرۆژە بە چ شێوەیەک پێشکەش دەکرێ ؟

## ٠٦- گرێدان و بەستراوەیی کۆمەڵە :

لە هەر کۆمەڵگایەکدا کە ئازادیی پێکهێنانی کۆمەڵە و ڕێکخستن هەیە، کۆمەڵە بەگوێرەی ئامانج و شوێنی کاری خۆی لە ئاستی هەرێمیی، نەتەوەیی و نێونەتەوەییدا ، هەندێ پەیوەندیی بە لایەنی جیاوازەوە دەبەستێ. ئامانجی ئەوجۆرە پەیوەندییانە، لە سەر هەر ئاستێک بێ، بۆ ئەوەیە کە ئەو جۆرە کۆمەلانەی هاوئامانج بە یەک دەنگیی بۆ بابەتی هاوبەش هەنگاو هەڵگرن، یاخود پێکەوە هاوکاریی بکەن و کاریگەریی خۆیان بەهێزتر بکەن بۆ چارەسەرکردنی بابەتە هاونیازەکانیان. بۆ نمونە، مرۆڤ دەتوانێ کۆمەڵەی ژنان، کۆمەڵەی ئاشتیی، سەندیکای کرێکاران، کۆمەڵەی کرێچییان، کۆمەڵەی پەنابەران و بیانیان و کۆمەڵەی کەمئەندامان، کۆمەڵەی پەروەردە ...هتد دامەزرێنێ. ئەو ڕێکخراوانەی نوێنەرایەتی پەیوەندییەکانی هەرێمیی، نەتەوەیی و نێونەتەوەیی دەکەن لە سوید، بریتین لە: کۆمیتەی ئاشتیی و Lo,TCO,SAF,ABF,HSO,FKKS نمونەی پەیوەندیی نەتەوەییە .(Riksnivå)

ئەو کوردانەی لە سوید نیشتەجێن بۆ ئەوەی لەسەر بابەتی هاوبەش خۆیان ڕێکبخەن و دەنگی خۆیان لە ئاستی سویددا بکەنە یەک، لە مانگی گوڵانی ١٩٨١دا فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانیان دامەزراند. ئێستا

## ٥. ٣ پرۆژە :

پرۆژە یەکێکە لەو بابەتە گرنگانە کە کۆمەڵە دەبێ بایەخێکی زۆری پێ بدات. کۆمەڵە هەمیشە دەبێ هەوڵی ئامادەکردنی پرۆژە بدات، بۆ ئەوەی ئەرکە کولتوریی و کۆمەلایەتییەکانی باشتر بەرێوە بەرێ. پرۆژە لەسەر بابەتێکی تایبەتی و بۆ ماوەیەکی دیاریکراو ئامادە دەکرێ. پرۆژە دەتوانێ لەسەر بنەمای بیرێک ئامادە بکرێ. بۆ پرۆژە پێویستە پلانێک دابنرێ، ئەوەی خوارەوە نمونەی ئەو پلانەیە کە لە ئامادەکردنیدا دەبێ لەبەرچاو بگیرێ:

- ناوی پرۆژە : ئەگەر پەیوەندیی لە نێوان ناو و ناوەڕۆکی پرۆژەدا هەبێ باشترە.
- بیری پرۆژەکە و هۆیەکەی : بۆچی بیری وا ؟ ڕونکردنەوەی هۆیەکە.
- مەبەست : بەو پرۆژەیە دەتانەوێ چی بکەن، ئەو پرۆژەیە بۆ چییە؟
- ئامانج ، دەتانەوێ بە چ ئامانجێک بگەن. ئامانج دەبێ بەشێوەیەکی ڕون بنوسرێ کە خوێنەر لێی تێ بگات.
- گروپی بابەتەکانی پرۆژە : ئێوە لە ئەنجامی پرۆژەکەدا ، بۆ کێ و کام گروپ کار دەکەن.
- ماوەی پرۆژەکە : سەرەتا و تەواو بوونی.

- چالاکیی منالآن و لاوان (Barn och uvngdomsverksamhet)
- بەڕێوەبردنی پەروەردە (Utbildningsförvaltningen)
- شورای پارێزگا- بەربەرەکانیی لەگەڵ ئایدز و سێکس و پێکەوە ژیان
(LAFA- Iandstinget förebyggande Aids- Sex och Samlevnad)
- کۆمیسیۆنی پارێزگا بۆ کار (Länsarbetsnämnden).
- ئینستیتیوتی تەندروستی گەل (Folkhälsoinstitutet).
- بەڕێوەبەرایەتی خەرجکردن (Konsumentverket).
- بەڕێوەبەرایەتی لاوان (Ungdomsstyrelse).
- وەزارەتی کاروباری دەرەوە (UD).
- ئینستیتیوتی سویدیی (Svenska Institutet).
- ڕێکخراوی باشور بۆ کاری ولاتانی دواکەوتوو
.(Forum Syd om u-länder)
- سندقی یادی ئۆلۆف پالمە (Olof Palmes minnesfond).
- یەکێتیی ئەوروپا (Europeiska unionen).
- فۆندی میراتی گشتی (Almänna Arvfonden)

Arvfondsdelegationen
Socialdepartementet
103 33 Stockholm

- یارمەتی پرۆژەکان (Projektanslag)
- یارمەتی چالاکییەکان (Aktivitetsstöd)
- یارمەتی چالاکی کولتوری (Kulturstöd)
- یارمەتی کار و ڕێکخستن (Verksamhets och organisationsbidrag)

شێوەی یارمەتی (یارمەتی چالاکییەکان) و (یارمەتی کار و ڕێکخستن) لە هەر شارەوانی و پارێزگایەک بۆ کۆمەڵەکان بە مەرجێکە، کە کۆمەڵە داوای یارمەتی ساڵانەی ڕەوانە بکات بۆ ئەو دەزگایانەی کە یارمەتی دەدەن. هەروەها مەرجی هەندێ لەوانە جیاوازیی لەگەڵ جێیەکی تر. هەیە بۆیە پێویستە کۆمەڵە پەیوەندیی بکات بە شارەوانی و شورای شارەکەیەوە تا مەرجی وەرگرتنی ئەو دوو جۆرە یارمەتییە بزانێ و لە وەرگرتنیان بێبەش نەبێ.

جۆرەکانی تری یارمەتی کە پەیوەستن بە کار و چالاکیی جیاوازەوە، دەکرێ لە دەزگای جیاوازی نەتەوەیی یان هەرێمیی وەربگیرێت. ناوی هەندێ لەو دەزگایانە لە خوارەوە نوسراوە، بەڵام زۆر دەزگا و ڕێکخراو و وەقف (نەزەر) و بەڕێوەبەرایەتی ڕەسمیی تر هەن کە پەیوەندیان بە کار و خەبات و پرۆژەوە هەیە. کۆمەڵە دەتوانێ بۆ بەڕێوەبردنی کارەکانی، داوای یارمەتییان لێ بکات.

یەکێک لەو جێیانەی کە هەموو کۆمەڵە کوردییەکانی ئەندامی فیدراسیۆن پێویستە هاوکاریی لەگەڵ بکەن ABFە، هۆیەکەشی ئەوەیە کە فیدراسیۆن لە ئاستی هاوکاریی نەتەوەییدا ئەندامی ABFە و پەیمانی هاوکاریی لە نێوان مەڵبەندنی ناوەندیی هەر دوولادا هەیە. بۆیە بۆ کۆمەڵەکانی ئەندامی فیدراسیۆن سودی زۆرە کە ببنە ئەندامی ABF یان پەیمانی هاوکاریی لە ئاستی هەرێمەکاندا لەگەڵ لقەکانی ABF مۆر بکەن. لەم بارەیەوە ئاگاداریی زیاتر لەو بەشەدا هاتووە کە پەیوەندیی بە فیدراسیۆنەوە هەیە. هەروەها زۆر لایەنی تر هەیە کە مرۆڤ دەتوانێ داوای یارمەتییان لێ بکات، وەک:

- شارەوانی
- بەڕێوەبەرایەتی کاروباری وەرزشیی (Idrottsförvaltningen)

وەردەگیرێ. دیسان لە سەر ئەو بابەتە بۆچوونی جیاواز هەیە، دەگوترێ یارمەتی حکومەت و شارەوانی، چوارچێوەی کاری کۆمەڵەکان (تەسک) دەکات و بەخۆیەوە گرێ دەدات.

**٥. ١ مافی ئەندامەتی :**

مافی ئەندامەتی لە کۆمەڵەی ئیدیالدا هەردەم هەیە و مەرجێکی بنچینەیی ئەندام بوونە لە کۆمەڵەدا. مافی ئەندامەتی سەرچاوەی دارایی و بەڕێوەبردنی کاروباری کۆمەڵەی ئیدیالە. بە گوێرەی کۆمەڵە گۆڕانی بەسەردا دێ و لە کۆنگرەدا ڕادەی دیاریی دەکرێ. دەبێ بە گوێرەی داهاتی ئەندام ڕێژەی زۆر نەبێ. لەبەر ئەوە مافی ئەندامەتی بۆ کۆمەڵە مەرجە، چونکە پەیوەندیی ڕاستەخۆی هەیە لە نێوان مافی ئەندامەتی و ژمارەی ئەندامان و وەرگرتنی یارمەتی لە شارەوانی و شورای شارەکاندا. پەسەند کردنی بڕیاری دانی یارمەتی بە کۆمەڵەکان لە لایەن دەزگا ڕەسمییەکانەوە بە گوێرەی ژمارەی ئەندام و کۆکردنەوەی مافی ئەندامەتی (Betalande medlemmar) لە ئەندامان دیاری دەکرێ.

**٥. ٢ یارمەتی- بیدراگ :**

گەلێک لایەن هەن کە کۆمەڵە دەتوانێ داوای یارمەتییان لێ بکات. ئەو یارمەتییە هەندێ جار پارەیە و هەندێ جار شوێن (لۆکاڵ) و هەشە بە شێوەی تر یارمەتی کۆمەڵە دەدەن. زۆر بوونی یارمەتی بە گوێرەی گەورەیی و چالاکیی کۆمەڵە دەگۆڕێ. کاتێ کۆمەڵە دادەمەزرێ، بۆ وەرگرتنی یارمەتی پێویستە پەیوەندی بە شارەوانی شارەکەیەوە بکات. یارمەتی و پشتگیری ئابوریی کە لە لایەن دەزگاکانی حکومەت و شارەوانییەکانەوە ئامادە دەکرێ، بریتین لە:

- یارمەتی کۆرس و کاری پەروەردەیی (Kurs-och utbildnings bidrag)

### ٤.٤ کۆمیتەی ڕاوێژ :

لە کۆمەڵەی گەورەدا، کۆنگرە هاوکات لەگەڵ هەڵبژاردنی کۆمیتەی کارگێڕ و کۆمیتەی چاودێر، کۆمیتەیەکی تریش هەڵدەبژێری کە ناوی کۆمیتەی ڕاوێژە.

ئەو کۆمیتەیە لەنێوان دوو کۆنگرەی کۆمەڵەدا چاودێری کار و چالاکیی ئەندامان دەکات، پەیوەندیی بە کەسانی زانا و بە توانایەوە دەکات، بۆ ئەوەی ڕازیی بن ناویان بە کۆنگرە پێشنیاز بکات بۆ ئەندامەتی و کارکردن لە ئۆرگانەکانی کۆمەڵەدا. ڕاپۆرتی کۆمیتەی ڕاوێژ بۆ کۆنگرە پێشنیازە و ئەندامانی تریش دەتوانن خۆیان یان کەسانی تر بۆ کارکردن لە ئۆرگانەکانی کۆمەڵەدا بپاڵێون.

### ٥. سەرچاوەکانی ئابوریی کۆمەڵە :

یەکێک لە خاڵە گرنگەکانی کاری کۆمەڵە، ئابووری کۆمەڵەیە. پرینسیپی سەرەکی بۆ کۆمەڵەکانی ئیدیال ئەوەیە، کە کۆمەڵە بە یارمەتی ئابوری ئەندامانی خۆی کارەکانی بەڕێوە بەرێت و خۆی بە هیچ لایەنێک نەبەستێتەوە، بۆ ئەوەی سەربەخۆی خۆی بپارێزێ.

لە سوید وەک پێشتر باسکرا، زۆر دەزگای حکومەتی و شارەوانییەکان یارمەتی و پشتگیریی ئابوری کۆمەڵەکان دەکەن. مەبەست لەو یارمەتییانە ئەوە نییە کە کۆمەڵە گرێدراوی ئەو دەزگایانە بن یان بە گوێرەی ئامانجی ئەوان کار بکەن. ئەو یارمەتیانەی بە کۆمەڵەکان دەدرێ لە بودجەی حکومەت و شارەوانی، لە بنەڕەتدا لەو باجانە پێکدێ، کە لە دانیشتوانی سوید

دەدات، بۆیە هەڵبژاردنی وردی بەرپرسی دارایی لە کۆمەڵەدا کارێکی گرنگە. کاتێک گومان پەیدا بوو کە کاری ئابوری کۆمەڵە بە ڕاست و دروستیی بەڕێوە ناچێ، دەبێ دەستبەجێ گرفتەکە بخرێتە بەرباس و چارەسەر بکرێ. زۆرجار لەم بارەیەوە کەمتەرخەمی دەکرێ و بارەکە بە زیان دەگەڕێتەوە بۆ کۆمەڵە و لە هەمان کاتدا بۆ بەرپرسیاری داراییش.

### ٤. ٣ کۆمیتەی چاودێر :

لە کۆمەڵەدا زۆر گرنگە مرۆڤ بزانێ کاری ئابوری کۆمەڵەکە چۆن بەڕێوە دەچێ. ئەوە نەک تەنیا بۆ ئەندامەکانی کۆمەڵە، بەڵکو بۆ دەزگا پارمەتیدەرەکان و شارەوانییەکان و بەڕێوەبەرایەتی باجیش گرنگە، چونکە ئەو لایەنانە، هەریەک سەربەخۆ دەرفەتیان نیە، کاری ئابوری کۆمەڵە کۆنترۆڵ بکەن، لەبەر ئەوە کۆنگرە بۆ کۆنترۆلکردنی کاری ئابوری کۆمەڵە، کۆمیتەیەک هەڵدەبژێرێ. دەبێ ئەو کۆمیتەیە لە سێ کەس کەمتر نەبێ. ئەو کۆمیتەیە لە نێوان دوو کۆنگرەدا دەسەلاتدارە، چونکە تا ئێستا لە کۆمەڵەکاندا هەڵەی زەقی وەک (تاوانی) گرنگ ڕووی نەداوە، بۆیە دەزگا ڕەسمییەکان کۆمەڵەکانیان ناچار نەکردووە بۆ گرتنی ژمێریاری یاسایی لە دەرەوەی کۆمەڵە ڕێفیسۆر، پشکێنەر و ژمێریاری یاسایی بگرن. هەروەها ئەو کۆمیتەیە، کۆنترۆلکردنی دارایی کۆمەڵەی لە ئەستۆیە و دەبێ شێوەی داهات و خەرجی پارەی کۆمەڵە کۆنترۆڵ بکات و لە ڕاپۆرتێکدا پێشکەشی کۆمیتەی کارگێڕ و کۆنگرەی بکات.

ئەو کۆمیتەیە دەتوانێ پێشنیاز بکات بە کۆنگرە کە کارەکانی کۆمیتەی کارگێڕ، لە بواری ئابوریدا پەسەند بکات یان نەیکات.

٢- هەموو پرۆتۆکۆڵەکان ئەرشیف دەکات.
٣- لە نوسینی پرۆتۆکۆڵەکاندا پێویستە ئاگاداریی لە سەر بەڕێوەبردن و جێبەجێ کردنی بڕیارەکانی کۆمیتەی کارگێڕ هەبێت.
٤- ئەرشیفی کۆمەڵە دەپارێزێت.

**٤. ٢. ٤ بەرپرسی دارایی :**

یەکێک لە ئەرکە هەرە گرنگەکانی کۆمەڵە، بەڕێوەبردنی کاری ئابوورییە، بەرپرسی دارایی دەبێ لە کارەکەیدا هاوئاهەنگ بێ لەگەڵ سەرۆکی کۆمەڵە، بۆ ئەوەی باج و خەرجیی کۆمەڵە لە کاتی خۆیدا بدرێ. زۆر گرنگە ئەو کەسەی بە بەرپرسی دارایی هەڵدەبژێردرێ زانیاری لە بواری ئابوری و خشتە بە نویی (Bokföring) و ژمێریاریی و پشیکتەر (Redovisning) و بودجە (Budjet) هەبێ و لێی تێبگات.
باشتر وایە بەرپرسی دارایی مافی هەبێ لەگەڵ سەرۆک هەتا هەزار کرۆن لە حساب دەربێنێ و لە سەرووی هەزار کرۆن دەبێ بڕیاری کۆمیتەی کارگێڕی لەگەڵ بێت. ئەرکی بەرپرسی دارایی بریتییە لە:
- مافی ئەندامەتی کۆنترۆڵ دەکات و ئەندامان ئاگادار دەکاتەوە کە مافی ئەندامەتی خۆیان بدەن.
- بەرپرسیارە لە داواکردنی یارمەتی (Bidrag) لە دەزگا ڕەسمییەکانی حکومەت و شارەوانییەکان.
- خشتە بە نویی کۆمەڵەی لە ئەستۆیە، دەبێ پسولەی داهات و دەرچوونی حساباتی کۆمەڵە بپارێزێ.
- بەرپرسیارە لە خەرج و دانی موچە و باجی کۆمەڵە.
- بە هاوکاریی لەگەڵ ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ، پێشنیازی بودجەی ساڵانەی کۆمەڵە ئامادە و پێشکەشی کۆمیتەی کارگێڕی دەکات.
- دوا ڕاپۆرتی دارایی کۆمەڵە ئامادە دەکات و بەهۆی کۆمیتەی کارگێڕەوە پێشکەشی کۆنگرەی دەکات.
بەداخەوە زۆرجار خەرجکردنی نابەجێ و قەرزکردن لە کۆمەڵەدا ڕوو

### ٤. ٢. ١ سەرۆک :

یەکێک لە ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ دەبێ بە سەرۆکی کۆمەڵە هەڵبژێردرێ. هەڵبژاردنی سەرۆک دەکرێ ڕاستەوخۆ لە کۆنگرەدا ئەنجام بدرێ یان لە یەکەم کۆبوونەوەی کۆمیتەی کارگێڕدا. سەرۆک لە کۆمیتەی کارگێڕدا بەرپرسیاری سەرەکییە. دەبێ چاودێریی بەسەر کار و چالاکیی کۆمیتەی کارگێڕدا بکات. زۆر گرنگە، ئەو کەسەی بە سەرۆک هەڵدەبژێردرێ، مرۆڤێکی بەتوانا بێ لە بواری پەیوەندیی کۆمەڵایەتییەوە و زانا و ژیر بێ و باش گوێ لە داخوازیی ئەندامان بگرێ و کارامە بێ و بڕیارەکان بە باشیی جێبەجێ بکات.

### ٤. ٢. ٢ سکرتێر :

کاتێک سەرۆک لە کۆبوونەوەیەکدا ئامادە نەبێت، یان ئەگەر سەرۆک وازی لە کار هێنا و دەستی لە کار کێشایەوە، سکرتێر هەتا کۆنگرەی داهاتوو یان هەتا هەڵبژاردنی سەرۆکێکی تر لە لایەن کۆمیتەی کارگێڕەوە ئەرکی ئەو بەڕێوە دەبات. ئەو کەسەی بە سکرتێری کۆمەڵە هەڵدەبژێردرێ کارێکی زۆری نوسین و ناردنی دەکەوێتە ئەستۆ، بۆیە ئەو دەبێ زۆربەی کات لە مەڵبەندی کۆمەڵەکە بێت بۆ نوسین و کاری پۆست ناردن. ئەرکی سکرتێر بریتییە لە:

١– پرۆتۆکۆڵی کۆبوونەوەکانی کۆمیتەی کارگێڕ دەنوسێ و ئەگەر لە پرۆگرامی کۆمەڵەدا هاتبێ، پرۆتۆکۆڵەکان بۆ ئەندامانی کۆمەڵە دەنێرێ.

جگە لە ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ، دەبێ چەند ئەندامێکی جێگریش لە کۆنگرەدا بۆ کۆمیتەی کارگێڕ هەڵبژێرێن. ژمارەی ئەمانیش دەبێ لە پرۆگرام و پەیڕەودا ئاماژەی پێ کرابێ. ئەندامی جێگر دەتوانێ لە گشت کۆبوونەوەکانی کۆمیتەی کارگێڕدا بەشدار و هاوبەشی باس و گفتوگۆکان بێت و بەرپرسایەتیش وەرگرێ، بەڵام مافی دەنگدانی نیە. جێگر بە دوو شێوە دەتوانێ شوێنی ئەندام بگرێتەوە:

١- ئەندامی جێگر دەتوانێ جێگری ئەندامێکی ئەسڵیی کۆمیتەی کارگێڕ بێت، ئەگەر ئەندامەکە، ئەندامەتی لە دەستدا، جێگرەکە دەکەوێتەی جێگەی ئەو و شوێنی ئەو پڕ دەکاتەوە. ئەگەر کۆمەڵەیەک ئەو سیستیمە قبوڵ بکات، دەبێ بە ڕادەی ئەندامانی ئەسڵی لە کۆنگرەدا ئەندامی جێگریش هەڵبژێرێ.

٢- جێگر بەپێی ڕێژەی دەنگ هێنانی لە کۆنگرەدا جێگەی ئەندام دەگرێتەوە، واتە ئەگەر ئەندامێکی کۆمیتەکە دەرچوو یان وازی لە کار هێنا، یەکسەر جێگری یەکەم جێگای ئەو دەگرێتەوە و دەبێتە ئەندامی کۆمیتەکە، بۆ ئەم شێوەیە پێویست بەوە ناکات بە ڕادەی ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ، کۆنگرە جێگر هەڵبژێرێ، بەڵام دەبێ لە پرۆگرام و پەیڕەودا بە ڕونی بنوسرێ کە ئەگەر ئەندامێک نەما، کام جێگر جێگەی ئەو دەگرێتەوە.

لە یەکەم کۆبوونەوەی کۆمیتەی کارگێڕی دوای کۆنگرەدا پێویستە بەرپرسایەتی لە نێوان ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕدا دابەش بکرێ.

خاڵێکی گرنگ هەیە کە دەبێ کۆمەڵە و کۆنگرە بیری لێ بکەنەوە و لە پرۆگرام و پەیڕەودا بیگونجێنن، ئەوەش ئەوەیە کە ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕی پێشوو، هەتا کۆمیتەی نوێ دەست بەکار دەکات، کۆتایی پێ نایەت، بەڵکو پێویستە هەتا یەکەم کۆبوونەوەی کۆمیتەی کارگێڕی نوێ و دابەشکردنی کارەکانیان، لە کاری خۆیاندا بەردەوام بن. بۆ ئەمەش باشتر وایە کۆمیتەی کۆن و نوێ کۆبوونەوەیەکی هاوبەش پێک بێنن و کۆمیتەی کۆن لەو کۆبوونەوەیەدا ئەرکی خۆی بە کۆمیتەی نوێ بسپێرێ.

- کاتی ناکۆکیی لە نێوان ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕدا پەیدا دەبێ یا کێشەیەک سەرهەڵدەدا لەبەر دەم کۆمەڵەدا و کۆمیتەی کارگێڕ نەتوانێ چارەسەری بکات یا زۆربەی ئۆرگانەکانی کۆمەڵە کە لە کۆنگرەدا هەڵبژێراون لە کار دوور کەونەوە یا لە سەر داوای کۆمیتەی کارگێڕ و ...هتد.

- ژمارەیەکی تایبەتی ئەندامان بەپێی پرۆگرام و پەیڕەو داوای سازدانی کۆنگرەی نائاسایی بکەن، کۆمیتەی کارگێڕی کۆمەڵە ناچارە بانگەشەی کۆنگرەی نائاسایی بکات.

بۆ بانگەشە کردنی کۆنگرەی نائاسایی، سەرۆکی کۆمەڵە بەرپرسیارە. لە کۆنگرەی نائاساییدا، تەنیا ئەو بابەتانە دەکەونە بەرباس، کە بوونەتە هۆی پێکهاتنی کۆنگرەی نائاسای.

### ٤. ٢ کۆمیتەی کارگێڕ

کۆمیتەی کارگێڕ لە کۆنگرەدا هەڵدەبژێردرێ و بەرپرسیاری سەرەکییە لە بەڕێوەبردنی کاری کۆمەڵەدا. دەربارەی ژمارەی ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ هیچ مەرجێکی یاسایی نیە و ژمارەی ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ بە گوێرەی گەورەیی و بچوکیی کۆمەڵە گۆڕانی بەسەردا دێ، بەلام هەندێک بەرپرسیاریی هەیە کە دەبێ لەو کۆمەلانەدا کە ئەندامی فیدراسیۆنن هەبێ، وەک:

- سەرۆک:
- سکرتێر:
- لێپرسراوی ئابوری:

جگە لەو بەرپرسیارە سەرەکیانە، بەرپرسیارانی تر بە گوێرەی کۆمەڵە گۆڕانیان بەسەردا دێ.

کۆمیتەی کارگێڕ دەبێ بەپێی بەندەکانی پرۆگرام و پەیڕەوی و بڕیارەکانی کۆنگرە کارەکانی کۆمەڵە بەڕێوە بەرێ. بۆ کۆمەڵە گرنگە کە ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ چالاک بن و پەیوەندییان لەگەڵ یەکتردا باش بێت و هاوئاهەنگیی کاریان لە نێواندا هەبێت.

- بۆ کاری داهاتووی کۆمیتەی نوێ، پێشنیاز وەربگرێ.
- دوای تەواوبوونی کۆنگرە، پرۆتۆکۆڵەکانی کۆنگرە بە زمانی کوردی و سویدی بنوسێتەوە، ئیمزایان بکات و لە یەکەم کۆبوونەوەی کۆمیتەی کارگێڕدا، پێشکەش بە کۆمیتەی نوێی بکات.

### ٤. ١. ١. ٣ دەنگدان :

بۆ دەنگدان مەرجە مرۆڤ مافی ئەندامەتی دابێ. ئەو ئەندامەی مافی ئەندامەتی نەدابێ، مافی دەنگدانی نیە و مافی ئەوەشی نیە خۆی بۆ ئۆرگانەکان بپاڵێوێ، بەڵام دەتوانێ وەک میوان بەشداریی کۆنگرە بکات.
وەک پرینسیپ، هەر ئەندامێک یەک دەنگی هەیە، ئەوەش پرینسیپێکی دیموکراتییە و پێویستە مافی دەنگدان و شێوەی دەنگدان بە ڕونی لە پرۆگرام و پەیڕەودا تۆمار کرابێ. باشترین شێوە ئەوەیە کە کۆنگرە لە سەر بابەتە جیاوازەکان گفتوگۆ بکات و بگاتە بڕیاری هاوبەش، بەڵام هەموو جارێ بەو شێوەیە ناڕوا، لەوانەیە پێشنیازێک پێویستیی پەیدا بکات، دەنگی بۆ وەرگرن. لەو حاڵەتەدا، نوێنەران دەبێ دەنگ بدەن و پێشنیازەکە بە زۆربەی دەنگی نوێنەران پەسەند بکەن. دەنگدان بە شێوەی نهێنی و ڕاستەوخۆ ئەنجام دەدرێ.

### ٤. ١. ٢ کۆنگرەی نائاسایی :

کۆنگرەی نائاسایی لە سەر بنەمای (ڕووداو و بابەت)ی نائاسایی دەبەسترێ. هۆی سازدانی کۆنگرەی نائاسایی لەوانەیە جیاواز بێ، وەک نمونەی ناکۆکی نێوان ئۆرگانەکانی بەڕێوەبەردا، یا لە سەر داخوازیی ژمارەیەکی تایبەت لە ئەندامان ...هتد، وەک پرینسیپ دەبێ مەرجی کۆنگرەی نائاسایی لە پرۆگرام و پەیڕەودا دیاریکرابێ. هەندێ هۆی سەرەکی بۆ بانگەشەی کۆنگرەی نائاسایی لەم خاڵانەی لە خوارەوەدا نوسراون:

- ڕاپۆرتی کار و چالاکییەکان.
- ڕاپۆرتی ئابوری.
- ڕاپۆرتی کۆمیتەی چاودێر.
- ڕاپۆرتی کۆمیتەی ڕاوێژ.

کۆمیتە و ئۆرگانەکانی کۆمەڵە دەبێ مانگێک بەر لە پێکهاتنی کۆنگرە، ڕاپۆرتی خۆیان پێشکەشی کۆمیتەی کارگێڕ بکەن. کۆمیتەی کارگێڕ دەبێ ڕاپۆرتەکان پەسەند بکات و لەگەڵ بانگهێشتنی ئەندامان بۆ کۆنگرە، پێشکەشی ئەندامانی کۆمەڵەی بکات.

**٤. ١ .١ کردنەوەی کۆنگرە :**

کۆمیتەی کارگێڕ دەبێ ئەندامانی ئامادە بوو لە کۆنگرەدا بژمێرێ، کاتێک دڵنیا بوو ژمارەی ئەندامانی بەشدار گەیشتوەتە (51٪)، کۆنگرە دەکاتەوە، دوای ئەوە کۆنگرە دەسەڵاتی بڕیار وەرگرتنی دەبێ.

**٤. ١. ١. ٢ کۆمیتەی بەڕێوەبەری کۆنگرە (دیوان) :**

دوای کردنەوەی کۆنگرە، نوێنەران بۆ بەڕێوەبردنی کۆنگرە، کۆمیتەی بەڕێوەبەری کۆنگرە هەڵدەبژێرن. ئەندامانی کۆمیتەی بەڕێوەبەری کۆنگرە (دیوان) لەناو خۆیاندا سەرۆک و پرۆتۆکۆڵنوس و دەنگ ژمێر و ژمێریاران هەڵدەبژێرن. کۆمیتەی بەڕێوەبەری کۆنگرە دەبێ:
- لیستەی ئەندامانی لەبەر دەستدا بێ.
- پرەنیسیپ و دیسیپلینی کۆنگرە بپارێزێ.
- بەرنامەی کاری کۆنگرە پێشکەشی ئەندامان بکات و دوای پەسەندکردنی، بە گوێرەی ئەوە کۆنگرە بەڕێوە ئەبرێ.
- لە پرۆتۆکۆڵدا، بڕیار و گۆڕانکاریی پرۆگرام و پەیڕەو یادداشت بکات و ناوی ئەندامانی هەڵبژێراو بۆ ئۆرگانەکان تۆمار بکات.

### ٤. ١. ١ کۆنگرەی ئاسایی :

کۆنگرەی ئاسایی ماوەیەکی تایبەت و دیاریکراوی لە پرۆگرام و پەیڕەودا بۆ دیاریی کراوە و بەپێی ئەو ماوەیە دەگیرێ. بۆ نموونە (سالیی جارێک ، دوو سال جارێ یان ماوەیەکی دیاریکراو.) هەموو ئەندامانی کۆمەلە دەتوانن بەشداریی تیادا بکەن. لە کۆنگرەی ئاساییدا ئەندامان لە سەر ئەو بابەتانە دەدوێن و بڕیار دەدەن کە لە بەرنامەیی کاردا هاتووە. کۆنگرەی ئاسایی بە شێوەی سەرەکی لە لایەن کۆمیتەی کارگێڕەوە بانگهێشتنی بۆ دەکرێ. بەرپرسیاری سەرەکی بۆ بانگهێشتن کردنی ئەندامان بۆ کۆنگرەی ئاسایی، کۆمیتەی کارگێڕی کۆمەلەیە.

هەردوو کۆنگرەی ئاسایی و نائاسایی بە بەشداربوونی (51%)ی ئەندامان دەست بەکار دەکات. ئەگەر ژمارەی ئەندامانی ئامادە بوو، کەمتر بوو لە ژمارەی پێویست، کۆنگرە بەپێی پرۆگرام و پەیڕەوی کۆمەلە (دوای پانزدە ڕۆژ، مانگێک یا ماوەیەکی دیاریکراوی تر) ساز دەکرێ. وەک پرینسیپی گشتی، لە جاری دووهەمدا، ژمارەی بەشداربووان لەبەر چاو ناگیرێ و بە ئامادە بوونی ئەوانەی هاتوون دەبەسترێ.

کۆمەلە دەتوانێ بۆ پێکهێنانی کۆنگرە، کۆمیتەیەکی تایبەتیی ئامادەکار دامەزرێنێ. ئەو ئەندامانەی دەیانەوێ کۆنگرە لە سەر پێشنیازەکانیان هەلوێستە بکات، پێویستە هەرکە ئاگاداری سازدانی کۆنگرە بوون، پێشنیازەکانیان بدەن بە کۆمیتەی کارگێڕ، تا بیانخاتە ناو بەرنامەی کاری کۆنگرەوە. ئەو ڕاپۆرتانەی دەبێ پێشکەشی کۆنگرە بکرێن، بریتین لە:

## ٤.١ کۆنگره :

کۆنگره بەرزترین و دەسەڵاتدارترین ئۆرگانی کۆمەڵەیە. بە بەشداریی (51%)ی ئەندامانی کۆمەڵە پێکدێ. ڕێسای گشتیی ئەوەیە کە ئەندامانی کۆمەڵە بتوانن لە سەر هەموو پرسەکانی کۆمەڵە گفتوگۆ بکەن، بڕیار بدەن و ئەندام بۆ ئۆرگانەکان هەڵبژێرن. پێویستە هەر بابەتێک کە لە کۆنگرەدا گفتوگۆی لە سەر دەکرێ و بڕیاری لە سەر دەدرێ، ئەبێ لە بەرنامەی کاریی کۆنگرەدا ئامـاژەی پێکرابێ. بەرنامەی کاری کۆنگره لە لایەن بەشدارانی کۆنگرەوە پەسەند دەکرێ. لە کۆنگرەی کۆمەڵەدا پێویستە ئەم بابەتانەی خوارەوە هەڵوێستەیان لە سەر بکرێ:

- ستروکتوری (ساختمان- قەوارە) کۆمەڵە.
- گۆڕانکاری لە پرۆگرام و پەیڕەودا.
- هەڵبژاردنی ئەندام بۆ ئۆرگانەکانی کۆمەڵە.
- بودجە و ڕاپۆرتی ئابوری کۆمەڵە.
- ڕاپۆرتی کار و چالاکییەکان و هەڵسەنگاندنیان.
- پلانی خەبات.
- ئازادکردنی بەرپرسیاران و ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ لە بەرپرسایەتی بە پەسەند کردنی ڕاپۆرتەکان.
- هەڵوەشاندنەوەی کۆمەڵە.

کۆنگرەی کۆمەڵە بە دوو شێوەی ئاسایی و نائاسایی پێکدێ.

### ٣. بەڕێوبردنی کاری کۆمەڵە :

وەک لە سەرەتادا ئاماژەمان پێکرد، کۆمەڵە یەکیەتییەکی ئازادە لە نێوان ئەو کەسانەدا کە خاوەن بەرژەوەندی و ئاوات و ئامانجی هاوبەشن. شێوازی ئەو ڕێکخستنە، بەڕێوەبردنی کارو خەبات دیاری دەکات. لە کار و باری کۆمەڵەدا، سەرکەوتن بە بەشداربوون و بەڕێوەبردن گرێدراوە.
لە هەندێک کۆمەڵەی بچوکدا، زۆرجار دەبینرێ کەسێک بەرپرسیاری چەند کارێکە. پێویستە ئەو مەسەلەیە بە چاکیی چارەسەر بکرێ، ئەگەرنا سنوری بەرپرسایەتی جیاواز تێکەڵی یەکتر دەبن. لەبەر ئەوە باشترە هەر کەسەی بەرپرسیاری کارێک بێ لە کۆمەڵەدا.

### ٤. ئۆرگانەکانی کۆمەڵە

کۆمەڵە بە شێوەی گشتیی لە چەند ئۆرگانێکی سەرەکی پێکدێ. بە گوێرەی گەورەیی یا تایبەتمەندییەکانی دەتوانرێ لە کۆمەڵەدا، جگە لەو ئۆرگانانەی کە لە خوارەوە ئاماژەیان پێکراوە، هەندێ ئۆرگانی تریش دانرێ. بە گشتیی لە هەر کۆمەڵەیەکدا دەبێ ئەم ئۆرگانە سەرەکیانە هەبن:
- کۆنگرە
- کۆمیتەی کارگێڕ
- کۆمیتەی چاودێر
- کۆمیتەی ڕاوێژ

پێویستە لە پەیڕەو و پرۆگرامی کۆمەڵەدا بە ڕونی داڕێژرابێت و پێویستی بە شیکردنەوە نەبێت. ئەو پرینسیپە، کە بە شێوەیەکی گشتیی پێوانی دیموکراتی ببوون و دیموکراتیی کار و خەباتی کۆمەڵەی ئیدیال نیشان دەدات، دەبێ پەسەند بکرێ.

وەک ڕێسایەکی گشتیی کۆنگرەی کۆمەڵە دەسەڵاتی بڕیاری دەرکردنی ئەندامی هەیە، بەڵام بە شێوەیەکی کاتیی بە مەرجێک گونجاو بێت لەگەڵ پەیڕەو و پرۆگرامی کۆمەڵە، کۆمیتەی کارگێڕ دەسەڵاتی هەبێ ئەندامەتی ئەندامێک هەڵپەسێرێ تا لە کۆنگرەدا بڕیار وەردەگیرێت. بەرلەوەی ئەندامێک دەربکرێ، پێویستە لە کۆنگرەدا دەرفەتی بدرێتێ بۆچوونی خۆی ڕابگەیەنێ و بۆ پەسەند کردنی بڕیارێکی لەوجۆرەش پێویستە هۆی بەرچاو هەبن.

### ٤،٢. لیستەی ناوی ئەندامان :

هەر کۆمەڵەیەک دەبێ لیستی ئەندامانی خۆی هەبێ و ناونیشان ، ژمارەی تەلەفۆن و ئەگەر هەبێ ناونیشانی پۆستی ئەلێکترۆنیی e-mailی تیادا نوسرابێ. باشە کە هەر کۆمەڵەیەک فۆرمێکی تایبەت بۆ ئەم مەبەستە ئامادە بکات.

## ٢. ٣ له ئەندام خستن :

له کۆمەڵەیەکی ئیدیالدا، ئەندام به ئاسانیی ئەندامەتی لێ وەرناگیرێتەوه. بێگومان کۆمەڵەی ئیدیال وەک هەموو ڕێکخراوێکی تر بۆ ئەوەی کارەکانی به سەرکەوتوویی بەرەوپێشەوه بچن، دەبێ خۆی له کاری تێکدەرانه بپارێزێ.

مەرجی دەرکردنی ئەندام له کۆمەڵەدا دەبێ به ڕونی له پەیڕەو و پرۆگرامی کۆمەڵەدا تۆمار کرابێ، تا ڕێگا بگیرێ له ئارەزووی تاکه کەسیی. بۆ ئەوەی ئەندامێک له کۆمەڵه دەربکرێ، پێویسته ئەو ئەندامه، له مەرجی سەرەکی دوور کەوتبێتەوه، ئەوەش پێویسته بسەلمێنرێت. دیسان پێش ئەوەی ئەندام دەربکرێ، دەبێ مافی بەرگریی کردنی پێ بدرێ و بتوانێ بەرگریی له خۆی بکات و بیروبۆچوونی خۆی ڕابگەیەنێ.

وەک له خاڵی وەرگرتنی ئەندامەتی دا هاتووه، که پەسەندکردنی ئامانج و پەیڕەو و پرۆگرامی کۆمەڵه و دانی مافی ئەندامەتی مەرجی سەرەکی به ئەندام بوونه له کۆمەڵەی ئیدیالدا، بۆیه بۆ دەرخستن له ئەندامەتی، دەبێ یەک یان هەردوو مەرجی ئەندامەتی که بۆ هەموو ئەندامێکی کۆمەڵه ڕون و ئاشکرایه، به ڕاشکاوی پێشێلکرابێ.

بیروبۆچوونی جیاواز یا بێ توانایی له بەڕێوەبردنی کاردا نابێته هۆی گفتوگۆ کردن و بنەما بۆ بڕیاری دەرکردن له ئەندامەتی. ئەو پرینسیپه

## ٢. ئەندامەتی :

### ١،٢ وەرگرتنی ئەندام

زۆربەی کۆمەڵەکان بەشێوەیەکی کراوە ئەندام وەردەگرن و دەبێ لە پەیڕەو و پرۆگرامی کۆمەڵەکانیشدا شێوەی ئەندام وەرگرتن بە ڕوونی نوسرابێت، چونکە یەکێک لە مەرجەکانی یارمەتی وەرگرتن و زەکات نەدان، والاکردنی دەرگای کۆمەڵەیە بۆ ئەندامان.

### ٢. ٢ وەرنەگرتنی ئەندام :

ئەگەر کەسێک داوای ئەندامەتی کرد و گومانی لێ بکرێ کە دژی ئامانج و پرینسیپەکانی کۆمەڵە کار دەکات، کۆمیتەی کارگێڕی کۆمەڵە دەتوانێ داواکەی ڕەت بکاتەوە، بەو مەرجەی هۆکارەکانی وەرنەگرتنی ئەندام بە ڕونی لە پەیڕەو و پرۆگرامی کۆمەڵەدا تۆمار کرابێ. ئەو کەسەی بە ئەندام وەرناگیرێ، مافی هەیە داوای خۆی بباتە کۆنگرەی کۆمەڵە.

### ١. ٣. ٤ ناونوس کردنی کۆمەڵە :

بۆ تۆمارکردنی ناوی کۆمەڵە هیچ دەزگایەکی ناوەندیی نیە. لە یاسادا هاتووە کە بۆ تۆمارکردنی ناوی کۆمەڵە (Register) هیچ ناوندێکی رەسمی نیە، بەلام لە هەندێ باری تایبەتییدا، کە داوای دامەزراندن یان کاریی کۆمەڵەیەکی ئیدیال دەکرێ، پێویستە کۆمەڵە لە هەندێ دەزگای حکومەتیدا خۆی ناونوس بکات.

کۆمەڵەیەک کە موچە و باج دەدات، پێویستە ناوی لە بەڕێوەبەرایەتی باج تۆمار بکرێ. ئەو کۆمەلانەی کە ناوی خۆیان لە بەڕێوەبەرایەتی باج تۆمار دەکەن، ژمارەیەکی (دە) یەکەیی تایبەت بە ڕێکخراوەکەیان دەدرێتێ، کە کۆمەڵەکەی پێ دەناسرێتەوە و لە کۆمەڵەکانی تری جیا دەکاتەوە. ئەو ژمارەیە پێی دەگوترێ ژمارەی ڕێکخراو یان (Organisationsnummer). دوای ناونوس کردنی کۆمەڵە و وەرگرتنی ژمارەی ڕێکخراو، کۆمەڵە دەتوانێ لە حسابی بانک یان پۆستگیرۆی تایبەت سود وەرگرێ.

لەم بوارەدا، ژمارەی ڕێکخراو گرنگە، چونکە ئەگەر کۆمەڵەیەک لە بەڕێوەبەرایەتی (PRV- Patent och regiserverket) خۆی ناونوس نەکردبێ، مافی خاوەنداریی پارێزراوی ناوی خۆی نیە و کۆمەڵەی تریش دەتوانێ هەمان ناو بۆ خۆی هەلبژێرێ. هەروەها ئەگەر کۆمەڵەیەک کاری بازرگانی بکات، یان دامەزرێنەرانی بیانەوێ ناوی کۆمەڵەکەیان لەلایەن کەسانی ترەوە بە کار نەیەت، دەبێ ناوی کۆمەڵەکەیان لە (PRV- Patent och regiserverket) ناونوس بکەن.

پرینسیپی تایبەتیی هەبێ، تا ڕێگا لە بەردەم گفتوگۆ لە سەر بنەماکان نەمێنێ. لە لایەکی تریشەوە، پێویست نیە پرۆگرام و پەیڕەوی ناوخۆی کۆمەڵە زۆر بێ و درێژ بنوسرێ کە مرۆڤ تاقەتی خوێندنەوەی نەبێ.

ئەو بابەتانەی کە پێویستن لە پرۆگرام و پەیڕەوی ناوخۆدا هەبن، بریتین لە:

- ناوی کۆمەڵە.
- شوێنی کۆمەڵە یان ئەو شارەوانییەی کۆمەڵەی لێ یە.
- ئامانجەکانی کۆمەڵە.
- مافی ئەندامەتی.
- بنەمای وەرگرتنی ئەندام و لە ئەندام خستن.
- پێکهێنانی کۆنگرە و ماف و شێوەی دەنگدان لە کۆنگرەدا.
- ئۆرگانەکانی کۆمەڵە و ئەرک و ژمارەی ئەندامانیان.
- ماوەی نێوان کۆنگرەکان.
- هەڵوەشاندنەوەی کۆمەڵە و بڕیاردان لەسەر سامانی کۆمەڵە لە دوای هەڵوەشاندنەوەی.

لەبەر نەبوونی یاسا و چوارچێوەیەکی دیاریکراو کە بڵێ چی لە پرۆگرام و پەیڕەوی ناوخۆی کۆمەڵەدا بنوسرێ، ئەو بابەتانەی سەرەوە لەگەڵ گەورە و بچوکیی کۆمەڵە و توانا ئابورییەکەیدا ئەگۆڕێت.

### ١. ٣. ٣ ئامانجی کۆمەڵە :

ئەو مەرجە پێویستە کە ئامانجی کۆمەڵە بە ڕوونیی لە پرۆگرامەکەیدا دەستنیشان کرابێ، بۆ ئەوەی بتوانێ لە زەکات دان ئازاد بکرێ و وەک کۆمەڵەیەکی ئیدیال تەماشای بکرێ.

## ١. ٣ دامەزراندنی کۆمەڵە

### ١. مافی دامەزراندنی کۆمەڵە :

هەروەکو پێشتر ئاماژەمان پێکرد، لە سوید مافی دامەزراندنی کۆمەڵە لە یاسادا مسۆگەر کراوە. لەبەر ئەوە بۆ بەکارهێنانی ئەو مافە پێویست ناکات پەیوەندی بە دەزگا ڕەسمیەکانەوە بگیرێ، بەڵام ئەگەر کۆمەڵەیەک بیەوێ وەک نمونە ناوی خۆی بپارێزێ، یان ئەگەر کۆمەڵەیەک کارمەند و کرێکاری هەبێ و ناچار بێ موچە و باج بدات یان کۆمەڵەیەک بیەوێ بۆ ڕاپەڕاندنی کارەکانی سود لە یارمەتی کۆمەلایەتی وەرگرێ، ئەوکاتە ئەندامانی پێویستە کۆمەڵەکەیان لە شارەوانیی هەرێمەکەیاندا ناونوس بکەن .

### ٢. پرۆگرام و پەیڕەوی کۆمەڵە :

بۆ ئەوەی کۆمەڵە شێوەی ڕەسمی بەخۆوە بگرێ، دەبێ لە لایەن ئەندامانی دامەزرێنەرەوە پرۆگرام و پەیڕەوی ناوخۆی بۆ پەسەند بکرێ. هیچ یاسا و بنەمایەک لە سوید نیە، کە بڵێ چ لەناو پرۆگرام و پەیڕەوی ناوخۆی کۆمەڵەدا بگوترێ. لەبەر ئەوە، پێویستە پرۆگرام و پەیڕەوی ناوخۆی کۆمەڵە لە بەڕێوەبردنی کاری کۆمەڵەدا وەک پەسەندکراوێکی یاسایی تەماشای بکرێ. زۆر گرنگە لە پرۆگرام و پەیڕەوی ناوخۆی کۆمەڵەدا بۆ هەر بابەتێک

لە سوید، یاسای بنەڕەتی مافی دامەزراندن و ئەندامەتی لە کۆمەڵەدا پاراستووە و بۆ ئەم مەبەستەش سنورێکی بۆ کاری کۆمەڵە دیاریی نەکردووە لە یاسادا، کە کۆمەڵە ناچار بکات پێیەوە خەریک بێ. مرۆڤ لە سوید دەتوانێ بۆ هەر مەبەستێک لەگەڵ کەسانی تر یەک بگرێ و کۆمەڵەیەک دابمەزرێنن.

هەروەها لە سوید دەزگا جیاوازەکانی وڵات لەوانە حکومەت، شارەوانی و...هتد، شێوە یارمەتییەکیان بۆ بەڕێوەبردنی کاری کۆمەڵەکان داناوە و بەشێک لە ئابوری کۆمەڵەکان دابین دەکەن و ئەمەش شێوە هاندانێکە بۆ کاری کۆمەلایەتی، کە لە وڵاتی سویددا بەرچاو دەکەوێ.

بۆیە ئەگەر مرۆڤ تەماشای هەندێ زانیاریی بکات لە سەر خەباتی کۆمەلایەتی لە سویددا، دەبینێ ژمارەی ئەندامانی کۆمەڵەکان زیاتر لە دە بەرابەری دانیشتووان ئەبن. واتە هەر کەسێک هاوکات ئەندامە لە چەند کۆمەڵەیەکدا و ژمارەی کۆمەڵەکانیش نزیکەی دوو سەد هەزارە.

دوو شێوەی بنەڕەتیی کۆمەڵە هەیە. یەکێکیان کۆمەڵەی ئابورییە و ئەوی تریان کۆمەڵەی ئیدیالە واتە (پیشەیی، کولتوریی، خزمەتگوزاریی و ...هتد). جیاوازیی لە نێوان ئەو دوو شێوە کۆمەلانەدا ئەوەیە: لە کۆمەڵەی ئابوریدا، ئامانج لە دامەزراندنی، پاراستنی بەرژەوەندی ئابوری ئەندامانە. بەگشتیی (هاوکاریی و کۆمەک- یارمەتی دان) ئامانجی ئەو کەسانەیە کە لە دەوری کۆمەڵەی ئابوریدا کۆدەبنەوە.

شێوەکەی تری کۆمەڵە، کۆمەڵەی ئیدیالە، کە بۆ پەیوەندیی و پرس و ئامانجی هاوبەش پێکدێ. مرۆڤ دەتوانێ لە ویست و داخوازی کرێچییەکانە تا دەگاتە پاراستنی ژینگە، مافی سەندیکای خاوەنکاران، کرێکاران، پاراستنی مافی مرۆڤ، کولتوریی، پەروەردە، وەرزش، بیانیان و ...هتد و هەر بابەتێکی تر کۆمەڵە دامەزرێنێ. کۆمەڵە لە ژیانی کۆمەلایەتی سویددا خاوەنی جێگە و شوێنی تایبەتە و گرنگایەتی مەزنی هەیە. بابەتە نوسراوەکانی ئەم نامیلکەیەی بەردەستتان لە سەر کۆمەڵەی ئیدیالە.

# بەشی یەکەم

## ١- کۆمەڵە

### ١. ١ کۆمەڵە چیە ؟

لە هەر کۆمەڵگایەکدا بۆ بەڕێوەبردنی ژیانی کۆمەڵایەتی، گەلێک شێوە و شێوازی جیاواز و جۆراوجۆری ڕێکخستن هەیە. یەک لەو شێوە ڕێکخستنانە لە کۆمەڵگای سەردەمدا ، کۆمەڵە و ئەندامێتی لە کۆمەڵە دایە.

کۆمەڵە لە سەر هەندێک چەمک و ئامانج یان بەرژەوەندی کۆمەڵایەتی، نەتەوەیی، پیشەیی و ...هتد، لەلایەن هەندێ کەسی هاوئامانجەوە دادەمەزرێ و یەکیەتییەکی ئازادە.

### ١. ٢ مافی دامەزراندنی کۆمەڵە لە وڵاتی سویددا:

لە هەندێ وڵاتدا ، مافی دامەزراندنی کۆمەڵە و ئەو ئەرک و بەرپرسایەتییەی کە کۆمەڵەی پێوە خەریک دەبێ یان بۆی نیە بیکات و هەروەها ئەو ژمارەیەی بۆ دامەزراندنی کۆمەڵە پێویستە لە یاسادا دیاریی کراوە.

نامـیلکەی (کـۆمـەڵە) وێنەیەکی دیموکـراتیی لە کـار و خـەباتی کـۆمـەڵە دەخـاتە بەرچاو و ڕێگا بۆ بە سیستم کردنی کار لە کۆمـەڵەدا خۆش دەکات. ئەم نامیلـکەیە لە دوو بەشی سەرەکی کۆمەڵە و فیـدراسیۆن پێکهاتووە و هـەر بەشەی لـە سـەر لایەنێکی گـرنگی کـاری کـۆمـەڵە و فیـدراسـیۆن هەڵوێسـتـە دەکات و ماف و بەرپرسـایەتی ئەندامـان و ئۆرگـانەکانی کـۆمەڵـە فیـدراسیۆن دەستنیشان دەکات و بنەمای کارکردنیش پتەوتر.

کۆمیتەی گشتیی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید
سەرۆکی فیدراسیۆن کەیا ئیزۆڵ

# پێشەکی

کۆمیتەی گشتیی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید لە پرۆسەی کۆبوونەوە و کۆنفرانسەکانیدا لەگەڵ کۆمەڵەکانی ئەندامیدا ، بەو ئاکامە گەیشت کە بۆ پەروەردە کردنی کۆمەڵەکانی، هاوئاهەنگیی کار و خەباتی بەردەوام و شێوەی دامەزراندنی پەیوەندیی لە نێوان کۆمەڵەکان و خۆیدا ، بەشداریی کۆمەڵەکان لە خەباتی کۆمەڵایەتی و چارەسەرکردنی گیروگرفتە کۆمەڵایەتییەکانیان لە کۆمەڵگای سویددا و بەگشتیی بۆ ئەوەی کۆمەڵگای کوردمان لە سوید پتر زانیاریی لە سەر دامەزراندنی کۆمەڵە پەیدا بکەن و بتوانن بێ گیروگرفت و بە شێوەیەکی دیموکراتی ئەرکی کۆمەڵە کوردییەکان بەڕێوە بەرن، بریاری نوسین و بڵاوکردنەوەی ئەم نامیلکەیەی پەسەند کرد، کە ناوی (کۆمەڵە)یە.

کۆمیتەی گشتیی بۆ ئەم پرۆژەیەی یارمەتی لە وەزارەتی تێکەڵاویی (ئینتێگراشون) وەرگرت و بە هاوکاریی ABFی ستۆکهۆلم کۆرسێکی پەروەردەکردنی بۆ کۆمەڵەکانی لە نینیسهامن پێکهێنا ، کە نوێنەری ٢٤ کۆمەڵەی ئەندام بەشدارییان تیادا کرد. دوای ئەمە، نامیلکەکەی بە دوو زاراوەی سۆرانی و کرمانجی ئامادە کرد. هەروەها فیدراسیۆن کۆمەڵەکانی خستە تۆڕی ئینتێرنێتەوە و دمیەوێ لە داهاتوودا کۆمەڵەکانی لاپەڕەی تایبەت بەخۆیان هەبێ.

٤. ٢. ١ سەرۆک
٤. ٢. ٢ سکرتێر
٤. ٢. ٤ بەرپرسی دارایی
٤. ٣ کۆمیتەی چاودێر
٤. ٤ کۆمیتەی راوێژ
٥. سەرچاوەکانی ئابوریی کۆمەڵە
٥. ١ مافی ئەندامەتی
٥. ٢ یارمەتی - بیدراک
٥. ٣ پرۆژە
٦. گرێدان و بەستراوەیی کۆمەڵە
**بەشی دووەم :**
٧. فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان، دامەزران و پەیوەندیی بە کۆمەڵەکانی ئەندامەوە
٧. ١ کورتەیەکی مێژوویی دەربارەی ئامانج و دامەزرانی
٧. ٢ ئامانجی فیدراسیۆن
٧. ٣ دامەزرانی فیدراسیۆن
٧. ٤ ئابوریی فیدراسیۆن
٧. ٥ پرینسیپەکانی ماف و بەرپرسایەتی فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی ئەندام لە بەرانبەر یەکتردا
٧. ٥. ١ ماف و بەرپرسایەتی فیدراسیۆن لە بەرانبەر کۆمەڵەکانی ئەندامدا
٧. ٥. ٢ ماف و بەرپرسایەتی کۆمەڵەکانی ئەندام لە بەرانبەر فیدراسیۆندا
٧. ٦ گرێدان و بەستراوەیی فیدراسیۆن لە سەر ئاستی نەتەوەیی و ناونەتەوەییدا
٧. ٧ کۆتایی

پێشەکی

بەشی یەکەم :


١. کۆمەڵە

١. ١ کۆمەڵە چیە ؟

١. ٢ مافی دامەزراندنی کۆمەڵە لە وڵاتی سویددا

١. ٣ دامەزراندنی کۆمەڵە

١. ٣ . ٣ ئامانجی کۆمەڵە

١. ٣. ٤ ناونوس کردنی کۆمەڵە

٢. ئەندامەتی

٢. ١ وەرگرتنی ئەندام

٢. ٢ وەرنەگرتنی ئەندام

٢. ٣ لە ئەندام خستن

٢. ٤ لیستەی ئەندامان

٣. بەڕێوەبردنی کاری کۆمەڵە

٤. ئۆرگانەکانی کۆمەڵە

٤. ١ کۆنگرە

٤. ١. ١ کۆنگرەی ئاسایی

٤. ١. ١ کردنەوەی کۆنگرە

٤. ١. ١. ٢ کۆمیتەی بەڕێوەبەری کۆنگرە (دیوان)

٤. ١. ١. ٣ دەنگدان

٤. ١. ٢ کۆنگرەی نائاسایی

٤. ٢ کۆمیتەی کارگێڕ

# له بڵاوکراوەکانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید


نوسین و ئامادە کردنی :

بەشی سۆرانی :

حامید گەوهەری

عەلی ڕەباتی

نەوزاد وەلی

بەشی کرمانجی :

مستەفا ئایدۆغان

ویلدان تانریکلو

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید

# کۆمەڵە

و

## چۆنیەتی دامەزراندن و بەڕێوەبردنی

ستۆکهۆڵم 2000

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید

# کۆمەڵە

و

چۆنیەتی دامەزراندن و بەڕێوەبردنی

ستۆکهۆلم 2000

ISBN: 91-631-0197-7